


"Dewlet her tim li
pey provakasyonan
da ku girtiyên
K'î bikuje û wan
bi fonksiyon bihêle.
Girtiyê ku piştî
50-60 rojî ji mirinê
velas be jî ji aliyê
mîsanî ve fonksiyona
wî namîne, jixwe
daxwaza dewletê jî
ve."



Malbatên vîr

Dewlet li pey tola têkçûna xwe ye

Hevpeyvîn li gel Veysel Turhan:

Divê HADEP xwe ji bo
şertên giran amadeke

R. 8-9

Roşan Lezgîn:

Tirsa leşkeran
ji kenê dayikekê


R. 6

Amed Tigrîs

Psîkolojiya xwe
kêm û biçûkdîtîne

R. 7

Sala fînalê li paş ma, sala Yekîtiya Neteweyî li we hemûyan pîroz be!

Azadiya **WELAT**

SAMI TAN

Di serî de medya kurd, saziyên neteweyî bi kar û xebata xwe dibin xerca vê yekîtiyê, di her warî de ji bo xurtkirina îradeya neteweyî ya giştî xebatê dikin. Ew sazî hêza xwe ji gelê xwe distînin.

Çapemeniya neteweyî û sala nû

Rojnameya Azadiya Welat bi vê hejmarê di destê we de digihêje, hejmarê sedî. Piştî du hejmarên din rojnameya me dikeve sê saliya xwe, ev jî bo çapemeniya kurd bûyereke ji rêzê nî e. Lewre heyama ku gelê kurd tê re derbas dibe, ne heyameke asayî ye. Gelê kurd bi salan e ku di nava şoreşê de ye; jî bo parastina hebûn û nixên xwe yê neteweyî û mirovî li ber xwe dide. Ji bo gelekî di vê rewşê de, hacetên ragihandinê girîng in. Bi van hacet û navgînan gel xwe nas dike; jî doz û têkoşîna xwe haydar dibe; xwe ji êrişên dijmin ên pişevîner (asîmîlekar) diparêze.

Divê em bi bir bixin ku sala pêşiya me sedsaliya rojnamegeriya kurdî ye jî. Ango sed salî berî niha (1898) kurdan dest bi weşandina rojnameya xwe ya yekemîn "Kurdistan"ê kirine. Saziyên neteweyî niha amadekariya hin çalakîyên pîrozbahiyê dikin. Li aliyê din xebatên ji bo Kongreya Neteweyî sala 1998'an jî bo gelê me dike saleke girîngtir.

Rewşa neteweya kurd, naşibe neteweyên din, lewre kurd wekî hinek welatên ewrûpî, li ser bazara neteweyî, di nav sînorên dewletekê de yekîtiya xwe pêk naynin, kurd bêgav in, sînorên heyî bi vî û têkoşîna xwe parçe bikin, yekîtiya xwe ya neteweyî pêşî di serê her kurdî de pêk binin. Piştî re jî li ser vê bingehê saziyên neteweyî damezirînin.

Heta îsal kurdan nekaribûne vê yekê pêk binin. Lewre jî çî kesê ku li ser kurdan çend rêzan dinivîse, bi nakokî û dubendiya di navbera kurdan de dest bi nivîsa xwe dike û gelek kes jî vê rewşê an bi lipaşmayîna civaka kurd ve girê didin, an jî wekî qedera kurdan destnîşan dikin. Hinek nivîskarên kurd jî vê rewşê bi "bextreşîya" gelê kurd ve girê didin. Ev dîtin bi serê xwe jî nexweşiyek e. Ev raman îradeya gelan û rêxistinên tune dihesibîne, rewşa heyî wekî çarenûsa (qedera) gelê kurd şîrove dike.

Lê Teverga Azadiyê, bi xebata xwe ya çend salan ev dîtin pûç derxist. Di demeke gelekî kurd de gelê kurd rakir ser

piyan. Di sala 1998'an de, gelê kurd amadekariya Kongreya Neteweyî dike, da ku doza xwe bixe rojeva dinyayê, vî "bextê reş" biguherîne. Çî kurdê ku îro di nava vê xebatê de cihê xwe bigire wê di pêşerojê de serbilind û serfiraz bibe. Lê kesê ku li derveyî vê xebatê bimîne, xwe jî vê xebatê dîr bigire, wê di pêşerojê de şermezar û tawanbar bibe.

Di serî de medya kurd, saziyên neteweyî bi kar û xebata xwe dibin xerca vê yekîtiyê, di her warî de ji bo xurtkirina îradeya neteweyî ya giştî xebatê dikin. Ew sazî hêza xwe ji gelê xwe distînin û bi xebat û çalakîyên xwe yekîtiya gel xurtîr dikin.

Azadiya Welat heta niha di vî warî de çî jê hat kir, lê jî bo ku gavên şayari heyamê bîn avêtin, pêwîstî bi lîxwedîderketineke xurtîr heye.

Sala yekîtiya neteweyî û sedsaliya rojnamegeriya kurdî li we giştan pîroz be.

Polîtîkayanê newê yê komara tirk ser

Ferhengok

ajal: sewal, heywan
arîçe: kêşe, problem
bajarok: navçe (ilçe)
barûdax: rewş (durum)
biwêj: îdiyom (deyim)
bizav: tevger, hereket
bizmik: xelesa devê berxikan
boçîn: dîtin (görüş)
ceet: laş (vücut)
col: birê pez
çak: baş, qenc (iyi)
çirk: saniye
dansal: demsal, werz
demjiyan: serdem
destnîşankirin: tespîtîkirin
dimahî: dawî (son)
dîrav: pere
dîbistana seretayî: ilkokul
diyarde: kirû (olgu)
dojeh: cehennem
durîştûn: pêkhatin (gerçekleşme)
eger: sedem, hoy (neden)
êsta: niha, nika (şimdi)
fenanî: mîna, wekî (gibi)
femanber: memûr
fêrgeh: dibistan (okul)
gewre: mezin
hêman: unsûr
hêrivandin: têkbirin, pelîşandin

hîşmendî: şîûr (bilinç)
hoz: êl, êşir
hoy: eger, sedem
jinênigari: biyografî
layengir: alîgir, terefdar
leheng: qehreman, nebez
lûtk: gopîtk (zirve)
mandîbûn: westûn
palemaz: êriş (saldiri)
palpiştî: piştigirî (destek)
perzan: nesîr (düzyazi)
peymangeh: enstitû
pîhê: qewîn, saxdem
pîşeyî: meslekî
pol: sinifê dibistanê
qam: bejn (boy)
qestîkirin: koçîkirin
ramyarî: siyasî
refîtar: kirin, tevgerîn
rûdan: tiştê pêkhatî
sebare: li ser (ilgili)
selmandin: teyîdkirin
şareza: pîspor (uzman)
şayesandin: taswîrkirin
şewaz: uslûp, stîl
şîyan: karîn, tewan
tatol: xem, metirsi
tawan: sûc
tege: awa (biçim)
tinaz: henek, qerf
zall: vala, tehna
xwend: surîşt, tebiyet
yane: gazîno
yamecî: alîkarî (yardım)
zanko: üniversite

ENGİN UMUT ZÖZAN

Dewleta tirk 74 seryo ke, sarê kurd sero politîkaya îmxaxa û înkarkerdin ramena. Sarêwedardeyena Qoçgirî ra bicime, heta sereyarddeyena Dêrsim, pêro qetlîam û gonîya dawasna.

Çiyê esto ke, no talih xirabinê kurd û Kurdistan, PKK ra piya wer-te ra dariyawê (hewadiya). Gerilayanê PKK miyaneyê faşîzm û kemalîzm şikna, împeryalist tersana û zordê ca verda. Hetê îdeolojîk-polîtîk ra bo, eskerî û dîplomatik het ra bo roz be roz beno wayîrê quwet.

KT sewetanê nîne ro wo ke, politîkaya xo tenê vurneno. Na rozedê rojnamevanan xo, roşnikaranê xo rusna Kurdistan. Nafakî ard, raştîya sarê kurd ra vejîyayî programdê, "Siyaset Meydanî"ya Ali Kırca de nîne fit qeseykerdeyênê. Qeseyê nînan çosmeyê (dormeyê) politîka MGK ra qe nevejîya. Gore dîne '(înan) artêşa tirk gerîla anto dereceya marjinal, wazîfeya xo kerda tamam. Vanê "Sirê ame meselaya teror." Nafakî sirê wazîfa siyasî der o. Yanê no, mesajê eskeran o. Îne a programê de ardê zon (ziwan). Ekê hîn me bo, sarê kurd, xona newê zilm vînenê ke, nîna kî (jî) meselaya kurd ser qesey kenê?! Sewetanê sarê kurd ra zaf zêrê nîne zandano kê şîye Kurdistan

analiz kerdê?!

Dereceya ke PKK rêzda, împeryalistan feteliyayanê neweyê rê donda. Gore hetê astêyanê xo de na meselaya kurd wazenê ke hal bikerê. No kî; "Se beno bibo, bê PKK bo"yo xo ra dewleta kî hetê wasteyenanê împeryalistan, na politîka serdê vîndenê.

Na rozedê Kurdistan rê şîyanê Org. I. Hakkı Karaydayı bo, şîyena

Çitur ke verendera vatenê:
"Kurd çîno" tepiya kî realîteya kurd qebûl kerdê.
Meşte kî PKK qebûl kenê,
hama tersamê ke afakî
PKK înan qebûl mekero.

rojnamevananê TC û ma rê nîne musneno.

Helbet cengo ke PKK ramneno kayanê niyaneno kena bêtêsir. TC wo ke hatan nika raştîya kurd înkarkerdenê, çitur beno ke nika kî politîkaya xo vurneno?

Çitur ke verendera vatenê: "Kurd çîno" tepiya kî realîte ya kurd qebûl kerdê. Afakî (fina) vatê: 'mesela ya kurd çîno, meselaya teror esto.' Nika kî mecbûr mendê, coka meselaya kurd qebûl kenê, hama vanê: 'Meseleya kurd bê PKK hal kemê'

Yanê roz be roz peyser nê. Vijêr çî kî qebûl nekerdenê, ewro mecbûr manenê qebûl kenê. Ewro kî qebûl nekenê meşt de mecbûr manenê qebûl kenê. Oyo ke nîne mecbûr verdanê; o kî xerca PKK ra çiyodê bîn niyo. Meşte kî PKK qebûl kenê, hama tersamê ke afakî PKK înan qebûl mekero. Politîkaya "Talîkeya îrfîca" bo, politîkaya 'wendayîne 8 serîyê' bo, politîka ya projeya aw û şaristan bo zerê xo de hem peyser şîyanê, hem kî rey-na tesis kerdêyena politîkaya kemalîsta klasik danowe. Osmanîyan de kay zaf bî. Dewleta tirk de kî winî yo.

Sarê kurd ebi PKK Kurdistanano cerdê (Başûr) sono, "Kongreya Neteweyî"û "Parlamentoya Neteweyî" PDK û Barzanî ano çokan. Gerîla kot Karadeniz û Akdeniz. Şoreşa Kurdistan kî risneno Tirkîye (Anatoliyê)

Endî ameyimê verê roza xeleşiyen û azadiyîn. Endî çî "Politîkayanê newe" ye dewleta tirk çî kî politîkayanê împeryalistan, çî Kurdistan de, çî kî Rohîlatê Miyani (Ortadoğu) de zey veren de yeno ramnên. Hîn ya kî niya raştîya kurd qebûl kerdê, hama fikrê azadî û sosyalîzma ke PKK der o, înan ê qe qebûl nekenê. Esas de tersanê dîne nîrawo.



Malbatên girtiyan:

Dewlet li pey tola têkçûna xwe ye

Dewleta tirk di qada navneteweyî de, di warê siyasî de her ku têk diçe, berê pêşin êrîşî ser girtîgehan dike. Heke li bûyerên berê yên girtîgehan bê nihêrtin, wê pir baş diyar bibe ku, dewlet tola têkçûna xwe ya di warê siyasî de ji girtiyan hildide. Sistema ku nikaribûye ji darbeya 12'ê rezberê 1980'an heta niha li girtîgehan bi cih bike, îro dixwaze pêk bîne. Di darbeya 12'yê rezberê de bi sedan girtî bi vî rengî ji aliyê dewletê ve ji ber ku li hemberî sistemê hucreyî derketibûn û doza mafên xwe yên insanî kiribûn, hatibûn kuştin. Di roja îroyîn de jî heman tişt diqewime. Sala çûyî jî ev bûyer bi hin awayan qewimîn, di Girtîgeha Amedê de 12 girtiyên PKK'yî û di Girtîgeha Bayrampaşayê de jî 12 şoreşger di rojiya mirinê de şehîd ketin. Berê jî bûyerên bi vî rengî di girtîgehên Buca û Ümraniyê de jî qewimîn. Li gorî rayedarên dewletê ew mafên ku girtî dixwazin, her çiqas mafên insanî bin jî, ji ber ku ev girtî PKK'yî ne nikarin bi wan re li ser masê rûnî û vî yekê jî wekî çalakiyeke PKK'ê a li hemberî qanûnan bi nav dikin.

Dewlet provake dike

Li aliyê din sistema hucreyî jî ji 12'ê rezberê heta roja îro dewletê nikaribûye bi cih bike, her çiqas zagon hatibin derxistin jî li hemberî berxwedanên girtiyan bi ser neketin. Derdorên aştxwaz jî sistema hucreyî wekî tolhildaneke dewletê û hewleke ku pê bala raya giştî bikişînin cihêkî din dinirxînin. Didine zanîn ku dewleta tirk dixwaze bi vî awayî têkçûna xwe ya di warê siyasî de bincil bike. Bûyera Girtîgeha Amedê jî bi vî rengî bû û rojiya mirinê ya ku di gulana 1996'an de qewimî jî û êrîşên li ser girtîgehan bi tevayî bi vî rengî qewimîn.

PKK'yî dîl in

Dewlet îro jî dixwaze li ser girtîgehên Erzorim û Naziliyê vî tecrûbeya xwe biceribîne. Wekî tê zanîn di qada navneteweyî kesên ku sîncdar in, bi du çareyan tîne binavkirin; girtiyan siyasî û yên adlî. Yanê kesên muxalîf wekî girtiyan siyasî tîne binavkirin û yên li derveyî van jî dibin ên adlî. Dîsa di şeran de jî, kesên ku bûne aliyê şer li gorî peymanên navneteweyî wekî dîl tîne binavkirin. Her wiha li gorî peymanên navneteweyî kuştina kesên dîl sîcekî navneteweyî ye. Lê Tirkiye jî ber ku PKK wekî aliyekî şer qebûl nake û dîsa dîlên PKK'yî wekî girtiyan siyasî jî nayên qebûl kirin. Ji ber vî yekê di qada navneteweyî de sîncdariyê jî qebûl nake. Heta dewlet jî bo ku dîlên PKK'yî jî holê rake û ji pirsgerêka girtiyan û girtîgehan xwe xelas bike, serî li riyên cur bi cur dide; wekî jî bo ku di navbera girtiyan û hêzên dewletê de pevçûn derkeve provakasyonan pêk tîne. Bi taybetî kadroyên faşist (bi taybetî gardiyan) digire girtîgehan, ew jî bi her awayî êrîşî ser girtiyan dikin û heta mafekî herî biçûk jî li girtiyan qedexe dikin.

Ji bo ku di girtîgehê de di navbera girtî û gardiyan - leşkeran de pirsgerêk derkeve ji girtiyan didine dijmin û çêran. Tendurustiya girtiyan xerab dibe, wan nabine ba dixtoran. Tu berhemên nivîskî nadin girtiyan. Her tim lêgerîn û destdanîna ser eşyayên girtiyan pêk tîne. Çalakiyên sportîf tîne qedexekirin, xweşûstîne qedexe dikin û hwd. Dema ku ev provakasyon encam nedin, îcar jî bi awayekî qanûnî bi ser wan ve diçin û sistema hucreyî derxistine holê.

Îqtîdara siyasî bi jiyana girtiyan dîlize

Malbatên girtiyan li hemberî van êrîşên dewletê daxuyanî dane çapemeniyê. Malbatên TUHAD-DER yên ANATOLIYÊ di daxuyaniya xwe ya nivîskî de dane zanîn ku îqtîdara siyasî bi jiyana girtiyan dîlize. Wezîrê Dadê Oltan Sungurlu jî ber dijminatîya wî ya taybet bi girtîgehan re heye, bi rojan e ku ew dixwazin vî bûyerê bi awayekî çareser bikin, lê tu encam derneketiye. TU-

“Dewlet her tim li pey provakasyonan e, da ku girtiyan PKK'yî bikuje û wan bêfonksiyon bihêle. Girtiyan ku piştî 50-60 rojê ji mirinê xelas be jî ji aliyê insanî ve fonksiyona wî namîne, jixwe daxwaza dewletê jî ev e.”

HAD-DER dide zanîn ku li Girtîgeha Erzorimê pêkûtiyên cur bi cur jî pêk tîne. Îdareya girtîgehê bi şevê kalorîferan di tefîne û kadroyên MHP'yî jî di girtîgehê de li girtiyan îşkenceyan dikin. Li aliyê din TUHAD-DER bal dikşîne ser rojiyên mirinê û dide zanîn ku heke di demeke kurt de çareseriyek pêk neyê, wê insan bimirin, qetlîam pêk werin. Berpîrê van qetlîaman jî wê dewlet be.

Dewlet dixwaze cendek ji girtîgehan derkevin

Dîsa di 25'ê rêbendana 1997'an de jî aliyê malbatên girtiyan yên Stenbolê civîneke çapemeniyê li Komeleya Mafên Mirovan hate lidarxisitn. Serokê TUHAD-DER a Stenbolê Halis Doğan da zanîn ku ev 42 roj in li girtîgehan grevên birçibûnê hene, dewlet bi awayekî jî girtiyan tolê hildide. Doğan bal kişande ser giranbûna birçibûnê û wiha axivî: “Dewlet dixwaze cendek ji girtîgehê derkevin, heke mirin çêbe, berpîsê vî îxqîdara siyasî ye. Em zarokên xwe sax dixwazin. Bi rojan e ku em bi wezîreta dadê re li ser vî mijarê diaxivin, lê tu encam jê derneket. Em Amedên nû, Ümraniyeyên nû, Bucayên nû naxwazin; em xwîn, wehşet û zilmê naxwazin.” Kesekî jî malbatên girtiyan ku lêzîmê wî di Girtîgeha Erzorimê de jî axivî, wî da zanîn ku dewlet her tim li pey provakasyonan e, da ku girtiyan PKK'yî bikuje û wan bêfonksiyon bihêle. Girtiyan ku piştî 50-60 rojê ji mirinê xelas be jî ji aliyê insanî ve fonksiyona wî namîne, jixwe daxwaza dewletê jî ev e. Lêzîmê girtiyan da zanîn ku heke mirinek çêbe wê dewlet jê berpîs be û ew jî tu carî dest jî dozê bernadin. Heke bi vî hawî bidomê, ewê jî beşdarî grevên birçibûnê bibin.

Li aliyê din HADEP'ê jî da zanîn ku heke di demeke kurt de ev pirsgerêk çareser nebe, mirin çêbin berpîsên wê jî dewlet be. Heke çareserî pêk neyê ewê jî li hemberî wê tevdira xwe bigirin.

NAVENDA NÛ ÇEYAN

Kurtenûçe

Naveroka mesaja Serokê Giştî yê PKK'ê Abdullah Öcalan ku demek berê pêşkêşî Rêxistina Îslamî ya Navneteweyî kiribû hate daxuyandin. Öcalan di mesaja xwe de wiha dibêje: “Pêwîst e dewletên îslamî hebûna gelê kurd û mafê çarenûsê yê wî bipejirînin. Wekî berê, niha jî gelê kurd bi qetlîam û jenosîdan rû bi rû dimîne. Rol û bandora siyaseta sîyonîst û Îsraîlê li ser bîrdoza tirk gelek xurt û bi xetere ye.” Wekî tê zanîn zîrveya rêxistina îslamî di navbera 9 û 11'ê berfanbarê li Tehranê pêk hatibû. Ji ber vî mesajê Demirel zû jî zîrveyê veqetiyabû.

Qetlîama Mereşê ku beriya 19 salan ji hêla faşîstan ve pêk hatibû, ji hêla xwendekar û partiyên siyasî ve hate şermezarkirin. Komek xwendekarên jî IYÖ-DER'ê li ber xwaringeha Zanîngeha Teknik a Stenbolê civiyan û bi dirûşmeyan qetlîam protestokir. Der heqê vî rojê de li SBF'ya Zanîngeha Stenbolê panelek ku serokê HADEP'a Eminönü Şeyho Demir, rojnamevan Ertuğrul Mavioglu û Av. Ali Rıza Dızdar beşdar bûn, pêk hat. ÖDP'ya Enqerê û Stenbolê û şaxên ku girêdayî DİSK/Genel-İş ne jî bi daxuyaniyan qetlîam protestokir.

Li gorî nûçeya “Washington Post” ku ji layê Lally Weymouth ve hatiye nivîsin; Serokwezîrê Tirkiyeyê Mesut Yılmaz gotiye ku ji bo berdana parlementera kurd Leyla Zana xebitiye, lê ev yek ji hêla Zana ve nehatiye pejirandin. Rojnameger Weymout li gorî nûnerekî kurd li Washingtonê dibêje ku Leyla Zana dixwaze hevalên wê jî bêne berdan. Her wiha di nivîsê de tê gotin ku Bill Clinton û Wezîra Karên Derve ya DYA'yê Madeleinê Albright jî ji Mesut Yılmaz xwestine ku ew der barê mafên mirovan, Kıbrıs û Egeyê de hin gavan biavêje.

Nivîskar û helbestvanê kovara “Kaldıraç” Burhanettin Akdoğan jî hêla hêzên militarîst ên tirk ve hate binçavkirin û bi îşkenceyan giran hate qetilkirin. Li hemberî vî yekê kovara Kaldıraç bi daxuyaniyeke çapemeniyê ev bûyera hovane protestokir. Dêrdorên demokratîk jî ev bûyer protestokirin û da zanîn ku gotinên rayedarên tirk ên li ser demokrasîyê giş derew in. Heman derdorên diyar kirin ku dewlet li aliyekî jî bo ku navê îşkencekariyê ji ser xwe rake, guherînen şekî pêk tîne, li aliyê din mirovan bi polîsên xwe dide kuştin.

Warê bêxwedî

1-Îroj hewesek ji berê bêhtir li ser ziman û edebiyata kurdî çêdibe. Bi çî awayî be û bi çî rengî be jî, kurd xwe digihînin berhemên bi kurdî. Lê çî fêde, nivîskarên me li ser karên xwe haydar nebûne.

Lê çî fêde, ez hê jî dibînim ku berhemên me ne li gorî pîvanên edebî tene nirxandin. Pîvanên jî dîr pîvanên edebî bêhtir rola xwe dilîzin. Em hê jî nivîskarên xwe li gorî bîr û baweriyên wan û rêxistinên wan dinirxînin. Ev li ser pêşveçûna edebiyeta me û qelîteya berhemên ku tîr afirandî, tesîreke neyînî dike. Divê em vî awayê nirxandinê bidin aliyekî, nehêlin nêzîkî qada edebî bibe. Xwedê qada edebî jî wan danûstandinan bistirîne.

Êdî em gihîştine asteke wiha ku em dikarin bibêjin romana kurdî fê nivîsandin. Pirtûkên me her ku diçe pirtir dibin û çavên me jî wan ditirsîn ku em bixwînin. Divê mirov vê jî bibêje; heke bi zimanekî mîna kurdî roman hatibe nivîsandin, çîrokek û helbestek hatibe nivîsandin, ew ziman, tu caran wînda nabe.


Edebiyata kurdî, mîna zarokeke berşir e. Em berê wê bidin kîjan alî, ew dê bi wî alî de biçê. Lê belê hespek tu caran nikare bi du alîyan de bibeze. Me edebiyata kurdî kiriye warekî bêxwedî, kî hatiye, hespê xwe li gorî kêfa xwe bezandîye û çûye. Heke xwediyê vî warî dernekeve holê jî ev war dê li ber lîngan biçê.

Îro li her derê romanek, çîrokek an jî helbesteke bi kurdî tê firotin. Wexta ku mirov li wan dinîhêre, dibîne ku her yek jî wan, jî aliyekî hatiye. Ji Bêrûdê, ji Elmanayê, ji Swêdê, ji Stenbolê, ji Başûr...

Her kurdek, li aliyekî dinyayê belav bûye. Û her cihê ku kurdek lê heye edebiyatek û zimanekî xwerû hatiye afirandin. Îro hêdî hêdî tîkiliyek di navbera wan de tê sazîkirin. Divê berî her tiştî, em, jî bo ku ev tîkîlî xurt bibe serê xwe biêşînin.

2-Heta ku nivîskar, hunermend û lîkolînerên me li nik hev necivin, em nikarin bigihêjin tu derê. Em dizanin, kesê hunermend, hebekî tîral e. Lê belê heta ku em nicivin û pîrsîgîrêkên xwe çareser nekin, zimanekî yekgirtî (standart) diyar nekin (ji bo vê gavê) berhemên me bi qasî ku em dixwazin nayên xwendin.

Me got, her pirtûkek jî aliyekî dinyayê hatiye. Ji lew re, zimanê wan jî nasibe hevûdu. Her yekî jî xwe re qayîdenin peyda kirine, li gorî wan nivîsîne. Tevî hin pîrsan jî, bîngeha kurmançî heye. Yê ku nîzanî bilê Hawarê bixwînin, bila Mîr Celadet bixwînin, dî re binivîsînin. Ne ku berê bi-



Ereb Şemo

Gava ku Ereb Şemo jînenîgariya xwe nivîsand, pexşaneke pêşketî di kurdî de nîn bû. Ji lew re em jî "Şivanê Kurd" re dibêjin roman. Lê îro ev celeb hunera me jî bi awayekî nûjen tê afirandin. Îro yek jî nav me rabe û romaneke mîna "Şivanê Kurd" binivîsîne, em nikarin jê re bibêjin roman.

nivîsînin, dî re li rîya fêrbûnê bigerin. Ji bo ku rê li ber vê yekê bê girtin, divê tîkiliyêke xurt di nav nivîskarên me û weşanxaneyên me de hebe.

Carinan hin pirtûkên bi kurdî tene berdestên me. Gelek jî wan, coşeke mezin dixin dilê mirov û kêfa mirov bi wan tê. Hinek jî wan jî dibin sedema ku mirov jî ber xwe fedî bike. Yek radibe pirtûkekê dimivîsîne, jî gundiyan wî pê ve tu kes jî zimanê wî fêhm nake. Yê din helbestên ku bi zimanekî din hatine nivîsandin, werdigerîne kurdî û dike yên xwe, yanê didize. Çî heyf, ku heta niha kesî tiştek jî ji wan re negotiye.

Ma ev warekî bêxwedî ye? Ma divê wîha bimîne? Na, divê em nehêlin ku ev war bê herimandin. Divê em li vî warî xwedî derkevin. Berhemên hêja pêşkêş bikin û jîyana xwe ya çandî bi hemû hunerên xwe bixemilînin.

Her yekî ku hîni nivîsandinê bibe, rahêje pênûsê û jî xwe re bibêje nivîskar, me li kêfê xist. Roj bi roj pirtûkên bi kurdî derdikevin. Gelo nivîskarên wan pirtûkan, berî ku bidin weşanê, bi kesî re peyivîne, fikra tu kesî standine, pirtûka xwe bi tu kesî dane xwendin, em nîzanî. Weşanxaneyên me vê fonksiyonê çawa bi cih tînin? Kes ni-

kare vê gavê li gorî xwe bi kurdî binivîsîne.

Ji bo ku em rê li ber vê yekê jî bigirin, divê tîkiliyêke xurt hebe di navbera nivîskarên me û weşanxaneyên me de hebe. Divê weşanxaneyên me jî êdî hewl bidin ku xwe li gorî pîvanên nûjen xwe bi rêxistin bikin.

3-Çiqas bi hejmareke kême be jî, îro, romana kurdî heye. Nivîskarên me di vî warî de bi hêzeke xurt dixebitin. Li Ewropayê, bi taybetî jî li Swêdê di warê romanê de xebatên xweş tîr kirin. Lê belê, divê em baş bizanibin, bê roman çî ye û ne çî ye. Çî fêyde ku rexnegirên me nîn in. Tew hin nivîskarên me hene, dibêjin qey danasîna pirtûkan, bi serê xwe rexne ye. Rexne çî ye, danasîna çî ye? Ma pesin bi tenê tîrî analîzan dike? Em berhemekê yan derdixin ber perê ezmanan, yan jî dixin bin lîngan. Ev bi tu awayî bi kerî bi pêşveçûnê nayê. Ji bo ku, ew, vê yekê fêhm bikin, hê jî wan re gelek heye. Me, zû bi zû rexnegir divê. Cihê ku rexne lê nebe, pêşketin jî nabe.

Gava ku Ereb Şemo jînenîgariya xwe nivîsand, pexşaneke pêşketî di kurdî de nîn bû. Ji lew re em jî "Şivanê Kurd" re dibêjin roman. Lê îro ev celeb hunera me jî bi awayekî nûjen tê afirandin. Îro yek jî nav me rabe û romaneke mîna "Şivanê Kurd" binivîsîne, em nikarin jê re bibêjin roman. Çî li ser navê romanê hebe, divê di naveroka wê de jî hebe.

Divê mirov bizanibe serpêhatî jî çîrokan, çîrokan jî ji romanên cuda bike. Serpêhatî tiştek e, çîrok tiştekî din e. Her yekê, teknîkeke wê heye. Roman û çîrok jî ji hev cuda ne. Em nikarin jî çîrokeke dirêj re bibêjin roman. Em nikarin bibêjin romana kurt an jî romana dirêj. Roman, roman e; çî kurt, çî dirêj. Roman bi hûrbîniyê û kêrbîniyan tê nivîsandin. Lê, taybetiyên wê yên ku wê jî çîrokê cuda dikin, ne ev tenê ne. Çîrok di bûyerê de bi qasî romanê nikare kûr bibe, honandina wê, ne wekî ya romanê ye. Çîrok, wekî formeke pexşanê, bi gîştî formeke kurt û konsantrekirî ye.

Bi gîştî bûyereke sereke heye û nivîskarê çîrokê xwe bi tenê li ser vê bûyera sereke konsantre dike. Lê di romanê de li kêleka bûyera sereke gelek bûyerên din jî tîr pêşkêşîkirin.

Mirov bi gelek hêlên xwe, jîngeh bi hemû taybetiyên xwe ve li ser çavan tîr xistin. Di romanê de şayesandina (taswîr) kesî, der û doran û bûyeran, jî çîrokê hûrtir û kûrtir e. Roman, jî e an jî wêneyê jîne ye; çîrok, beşek jî wê jîne ye.

Carinan hin pirtûkên bi kurdî tene berdestên me. Gelek jî wan, coşeke mezin dixin dilê mirov û kêfa mirov bi wan tê. Hinek jî wan jî dibin sedema ku mirov jî ber xwe fedî bike. Yek radibe pirtûkekê dinivîsîne, jî gundiyan wî pê ve tu kes jî zimanê wî fêhm nake. Yê din helbestên ku bi zimanekî din hatine nivîsandin, werdigerîne kurdî û dike yên xwe, yanê didize. Çî heyf, ku heta niha kesî tiştek jî ji wan re negotiye.

Di çîrokê de bûyereke tenê heye, lê di romanê de ne wiha ye. Di romanê de, hejmara bûyera zêde ye, hemû bûyerên ku hene jî li gorî sazîkirina wê romanê hatine nivîsandin û rêzkirin. Li gorî hejmara bûyera, hejmara kesan jî zêde dibê. Kesên ku di bûyera de ne, çiqas zêde bin, roman ew qas dirêj dibe. Ji ber ku, romannivîs nikare qala kesekî tenê bike. Ji bo ku bikaribe mijar û bûyerê xweş bide fêhmîkirin, divê qala hemû kesên ku di bûyera de ne bike. Her lehengek bi tevgerên xwe heye; bi şayesandî û psîkolojiyekê dikeve romanê. Hewce nûn e ku qala her kesê bibe, lê kesên ku di bûyera de çalak in, divê baş bê zelalkirin. Çîrok, nikare van hemû baran hilgire. Ew, bi qasî bûyereke xurt e; kesên wê bûyerê jî bi hejmar in, bi qasî kesê romanekê zelal nabin. Çîrok, carinan dibe ku qala kesekî jî bike, lê roman bi yek kesî û yek bûyerê nayê nivîsandin.

Romannivîs, çiqas nêzîkahî bi romanên biyanî re danîbe, ew qas jî xurt bûye. Ji ber vê yekê, divê tîkiliyê bi romanên biyanî re jî deyne û bi çavê nivîskarekî li wan binihêre. Ji ber ku nivîskarek nikare mîna xwendevanekî ji rêzê li berheman binihêre û wan bixwîne.

4- Me gelek tişt kişandine, me gelek tişt dîtine. Lê belê her ku em tîk çûne, me romanek, helbestek an jî çîrokek nivîsandîye. Em jî nû ve li xwe vegeriyan û mîna Celadet, me tiştên ku ji hev belav bûne dane ser hev, tûrikên xwe tîjê kirine û em jî nû ve meşiyane.

Jixwe, huner û edebiyat jî di gavên wiha de derkevin holê. Em giş dizanin ku huner şerekî wiha ye ku mirov çiqas

tîk biçe, ew qas jî bi ser dikeve û tûrikê xwe tîjî dike. Lê belê, her kesê ku tîk çûbe, nikare bibe nivîskar û hunermend. Ji bo hunermendî û nivîskariyê, hebekî jêhatîbûn û zanebûn jî divê.

Nivîskarên me, tiştên mîna hev û din dinivîsin. Me an çîrokek li ser jiyana şehîdekî an girtîgehê nivîsandîye; an çîrokekê gelêrî dubare kiriyê an jî dîsa berhemeke gelêrî li ser navê xwe çap kiriyê û gava em bala xwe didin wan giş jî dişibin hev. Çi dinivîsin bila binivîsin, lê bila neşibin hev û din. Helbestên me jî wiha ne. Îmajên me giş dişibin hev, mijarên me jî wekî wê. Ê ka guhartina rastîyê, ka kesayetiya hunermend, ka honandin û ka ji nû ve afirandin.

Helbesteke me yî xurt û pêşketî heye. Ê ji ber ku ji wan heye, helbest, herî hêsantir ji hunera e, gelek kesan dest bi nivîsandina helbestan kiriyê. Ev yek, di her zimanî de heye. Tew di zimanekî mîna kurdî de. Li gorî hinek helbestvanên me dema ku mirov du rêzikan li bin hev binivîsîne, wê bibe helbest; ew kes radibin pirtûkan çap dikin. Nivîskarên ku em bi serên wan sond dixwin, yekî rabûye çar rêzik nivîsandine, edilandine, li hev anîne û gotiyê helbest; lê naşibe helbestê. Bi tirkî, ji vî re dibêjin "tekerleme". (Kurdiya wê, mamik e.) Di nav zêrikên benîştan de derketin, ez bawer im. Lê belê, tu kesî ji wan re nedigot helbest.

Helbest, ne tenê nivîsandina rêzikan e. Ne tenê îmaj (îmge) e. Ne tenê xweşlihevanîna peyvyan e. Helbest, estetîkê divê, afirandinê divê, jî nû ve vejandinê divê. Helbestvan, wan gotinên ku di nav jiyana rojane de ne, yek bi yek dineqîne,

di bin şûrê de, di dilê xwe de digêrîne û dihone; kesayetiya xwe, bîr û baweriyên xwe û psîkolojiya xwe jî dixê nav û diguherîne. Helbestvan, piştî van hemû tiştan, bi şewazeke xweş û teşeyekî, dest bi afirandina helbesta xwe dike û dinivîsîne.

Helbest, ev e. Heke em nizanibin bê helbest çi ye jî, em divê bizanibin bê helbest ne çi ye. Di eslê xwe de, ev bi serê xwe bi mijare nivîseke sereke ye. Ger ez derfetê bibînim, ezê di nivîseke cuda de, bi awayekî fireh li ser vî mijarê rawestim.

5- Werger, ji zimanên din dibin. Kurdî bi van celeb xebatan bêhtir tê xemilandin. Lê belê, divê wergerek wisa bê kirin ku em bawer nekin ku ew berhem bi kurdî nehatiye nivîsandin. Divê werger, wê berhemê jî nû ve û bi kurdî binivîsîne. Yanê, divê kirasê kurdî li wê berhemê bike; û ew kiras, divê ne qetiyayî be.

Wexta ku mirov karê xwe bi zanebûnî bike, kesek nikare piştî mirov deyne erdê. Lê em çawa dikin? Em dibêjin he ma bila bişibe wergerê, besî me ye! Ma qet bi vî hawî dibe? Her berhem, bi zagonên zimanekî tê afirandin û nivîsandin. Gava ku mirov wergerê dike jî, li gorî zagonên zimanê xwe werdigerîne. Lê em çawa dikin? Em peyv bi peyv werdigerînin û dihelîn! Ma qey biwêj jî tîk wergerandin?

Hin werger tîk ber destên me ku bi zimanekî ecêb hatine wergerandin. Mirov, gava ku dixwîne, baş dizane ku ew pirtûk werger e. Rast e, em hê ew qas bi pêş neketine. Lê, ev yek nabe sedema ku em wergerên nebaş biveşînin. Ma

qey kesek tune ye ku em bi wan bişewîrin. Mekanîzmeyên ku min ji bo weşangeriyê anîn zimên, ji bo vî pirsê jî pir girîng in. Di warê de berpirsiyê mezînan dikeve ser milê weşanxaneyên kurd. Divê ew gava em hîn di destpêkê de ne, em nehêlin ku awayên xerab bibin pîvan.

6- Di vî warê edebiyatê de, em dikarin hinek tiştan ji bo kovar û rojnameyên me jî bibêjin. Nûdem, Avaşîn, Jiyana Rewşen, Nûbihar û Azadiya Welat (yên ku ez dikarim bi dest bixim, ev in) di warê hilbijartina nivîsan û helbestan de gelekî xemsariyê dikin. Di wan de, hinek nivîs, bi rastî ji belesebetên weşandin. Divê mirov tiştên heja binivîsîne û biveşîne.

Hela ew helbestên ku tîk weşandin, çi ne ji bo Xwedê. Ji bilî çend helbestan, min tiştên gelekî ecêb dîtine di wan de, li ser navê helbestê. Em hey li dora xwe dizivirin. Jixwe bi vî hawî serê me gêj bûye û em nizanin bê em çi dikin. Ma gelo, berpirsiyarên wan weşanan ji hunerê fêhm nakin. Ez nabêjim helbestên baş nayên weşandin; ez dibêjim helbestên nebaş tîk weşandin.


Ji bo teşwîqkirinê mirov dikare helbestekê biveşîne; lê ji vî pê ve qebûl nabe. Heke helbestên xweş û çak ji we re neyên, helbestan neweşînin. Dema tiştê tune be, tune ye; ma em çi bikin? Îcar ji bo ku tune ye, hûnê helbestên nebaş bi me bidin xwendin?

Hevalno! De ka werin, em jî îcar û pê ve hinekî din jî bifikirin û binivîsînin, paşê biveşînin û vî warê ku bêxwedî tê dîtîn, bi xwedî bikin.

I. SEYDO AYDOĞAN

Kesayetiya Mayakowskî

MEDENÎ FERHO



Di çîrokê de bûyereke tenê heye, lê di romanê de ne wiha ye. Di romanê de, hejmara bûyera zêde ye, hemû bûyerên ku hene jî li gorî sazîkirina wê romanê hatine nivîsandin û rêzkirin. Li gorî hejmara bûyera, hejmara kesan jî zêde dibê. Kesên ku di bûyera de ne, çiqas zêde bin, roman ew qas dirêj dibe. Ji ber ku, romannivîs nikare qala kesekî tenê bike. Ji bo ku bikaribe mijar û bûyerê xweş bide fêhmîkirin, divê qala hemû kesên ku di bûyera de ne bike. Her lehengek bi tevgerên xwe heye; bi şayesandî û psîkolojiyekê dikeve romanê. Hewce nûn e ku qala her kesê bibe, lê kesên ku di bûyera de çalak in, divê baş bê zelalkirin. Çîrok, nikare van hemû baran hilgire. Ew, bi qasî bûyereke xurt e; kesên wê bûyerê jî bi hejmar in, bi qasî kesê romanekê zelal nabin. Çîrok, carinan dibe ku qala kesekî jî bike, lê roman bi yek kesî û yek bûyerê nayê nivîsandin.

Kî dibêje bava ji zarokan ne berpirs in?

Demên ku kalik ji neviyan berpirs bûne, hatine jiyân. Jiyan ev e, ku sêv di dara sêvê de, tîrî di dara mêmê de, berû di dara berûyê de şîr dibe. Her cureyê ber, dikeve bin dara xwe. Cihuyan, di pir demjiyanan de xwestin ku berê xwe vêşêrin, ku bi ser neketin; di demên dawî de film û pirtûk, xwe bi perîşanî û encameke bêzarî, lê her dem serketî û bendeyî hêviya Xwedayê ola xwe nîşan didin. Bi kinc û şalên keji û tîrî rîqa û çavên tîrî hêstir derdixin ekranê. Ev daxwaza perîşanxwazî di nava ceste kurdan de jî xwe diyar dike û çî berdel bête dayin, jî naxwazin biguherin. Lê ne sêv ji binê dara sêvê dikeve binê dara berûyê, ne berû dikeve binê dara sêvê... Turgenyev di bîranîneke xwe de wiha dinivîsê: "Ez di warekî ku şeqam, pêhîn, lêdan, jiyana rojê bûn de hatime dinyayê û mezînan bûme. Lê, çî derewan bikim, vî derdorê ew dilxweşiya avêtina şeqamekê, kulmekê neda min. Min di temenê xwê de li kesî nedaye." (Her nivîskar ne Cihuyê û pêwîst nabe ku mîna Turgenyev be jî. Rêbaz û destûrên civakan ji hevûdin cuda ne. Kurd zarokên jinbavê ne. Ermenî dixwazin ku bibin Cihuyên sedsala bîstûyekê. Franz Werbel jî bi romana 'Li Çiyayê Musa Çil Roj' tevî vî karwanê bû.

Tîrî li hemberî suryaniyan rola 'Bexikê Mesîh' dilîzin. Bi daxwaza ku kurdan û wan mîna demên berê bîne hemberî hevûdin. Lê, ne gelê suryanî gelê duh û pêr e, ne kurd gelê duh û pêr in. (Lîstika çarenûsiya Dreyfus ne karê kurdan e.)

Komên xelkê ji bangewaziya westiyân, nivîskar û rewşenbîr û ji bîdengiyê newestiyân. Çîrok û çîvanokên kurdan pir in. Lê Brehmekî kurd dernakeve holê. (1928-84, Alfred Edmund Brehm, payeberzekî filolog î Elman) Vî ciwamêrê payeberz di hêla lawiran de pir berhemên giranbiha û balkêş nivîsîne. Berhemên nivîskarên kurd, ku yek mirov di naveroka wan de tune ne û ji hêla folklor û aferîna gel ve hatine avakirin, li gorî demê û hoyan ji bo bersivdana dem û dîrokê jî nûjen de hatine afirandin, tenê ji sedema navê wê, li bend û taqên ambargoyan dikevin. Ji bilî nivîskaran kes li maf û berjewendiyên nivîskaran napirse û kes jî ne mecbûr e bipirse. Bar li ser milên nivîskaran e. (Mayakowskî pir efsane hêrivandin. Lê ew bi xwe bi lez û xurtiyê berz bû gernas û qehremanê efsaneyî. Pêwîstî ew e ku nivîskarên kurd jî hewl bidin û di radeyê kesayetiya Mayakowskî de bijîn.)

Min ne dixwest ez ji çavên xwe bawer bikim!

Rojên bihar, rojine pir xweş in, bêhna mirovan bi wan rojan derdikeve, bêhn û hewa biharê mirovan kêfxweş dike, dilê mirovan fireh dike, rengê biharê yê kesk û hêşîn dîmenekî pir rind û sipehî diyar dike, bi kurtayî bihar dewlemendî ye, mizgînî ye, sipehîbûna xwezayê ye, kêfxweşî û dilfirehiya mirovan e. Ji bilî wan hemûyan tiştîne hîn girîngtir hene, wekî hev û din naskirina hevala Sarya.

Rojek ji rojên bihara 95'an bû. Em li malekê bingeh fireh, li Gundê Zîv navçeya Stenbolê bûn. Wê rojê guhartinek li wê malê çêbûbû. Lewre, qîza xwediyê malê hevaleke xwe, bi xwe re anîbû mal. Ew Nursen bû. Qîzeke kejk, giloke, çav xezal û kinik lê rind û delal bû, jîr û jêhatî xuya dikir û wisa bû jî. Ciwaneke ku li metropolê mezin bûbû, lê kamil û giran bû. Şarezabûna wê, bedena wê ya hûrik pir mezin xuya dikir. Kêm xebardan, hinekî jî şermokî bû.

Jêhatîbûna Nursenê xwe di jiyane de kifş dikir. Ji aliyekî ve nûçegihan, ji aliyê din ve şanoger bû, komelekar û xwendekar bû. Nursen hevaleke bi pergale bû, wext li xwe par kiribû, demekê li rojnameyê, demekê li NÇM ê, demekê din li komela KAYY-DER'ê, demekê jî li Zanîngeha Azad bû. Lê belê bi hestê xwe ew şervan bû, di xeyala xwe de li çiya bû.

Daxwaza wê ya herî mezin, nûçegihaniya şer bû. Rojekê din dîsa li wê malê dema me di vîde-

oyê de li lîstika ku Hüseyin Kaytan nivîsandibû "Govenda Hilo" a ku Nursenê bi navê Sarya dilîst temaşê dikir, di nav şîrovevê de ji min re digot: "Apo, heval soz daye min, dê min bişîne Başûr, ezê nûçegihaniya şer bikim. Pêwîst e ku gel taybetmendîya wî şerê bi



qirêj, gemarî û bi taybet bizanibe."

Min dizanibû ji kê re dibêje, lê heval bi nav nedikir. Dema ku wisa digot; ser rûyê wê tijî hestê tolhildanê dibûn, çavên wê diçirûsîn, mîna tîrêjên berqa biharê ku li nav çavên dijmin bikevin. Dixwest ku rojekê berî rojekê biçê. Biçe û tola hezar salan hilîne, pêşewaziyê ji jinan re bike, şewqa jinên Kurdistanê yê wekî Berîvan û Berîtan li cîhanê belav bike.

Sarya çû. Ji dêla pelerîne spî ve, bêjn û bala xwe bi çek û berikan xemiland, cihê govenda xwe guhest, ji eywana şanoyê derket, çû lûtkeya çiyayên herî bilind, li Zagrosan, li Zapê bi çiyaran re govend girt. Dîsa navê wê Sarya bû, lê wê carê ne di rola jineke lal û bêdeng de bû, êdî ew rastiyeke jiyane, çareserkirina pirsgerêka jinan bû.

Duh, min nedixwest ez ji çavên xwe bawer bikim. Lewre, berî niha bi demekê kurt, min lêkolîna Nursenê di rojnameyê de xwendibû û ez pir kêfxweş jî bûbûm. Lê duh û îro, wêneyê Nursenê! Di rojnameyê de Sarya ketibû nav karwana şehîdan, êdî hew bi çiyaran re govend digirt, ew bilind bûbû, dest dabû stêrkan, da ku govenda stêrka bigire. Bûbû dîrok mîna anahîtayên Mezopotamyayê. Dê jinên kurd li jor bîne zimên, li ezmanê bilind, êdî ewê bi stêrkan re govendê bigire.

M.EMİN ALTOX

Tirsa leşkeran ji kenê dayikekê

Cara yekemîn di pîrozbahiyên cejna Newroza sala 1997'an de, ketibû ber çavê min. Em di nava girseyê de li hev qelîbûn. Ji dûxana bi teniya lastîkan ku di qada pîrozkirina Newrozê de hatibûn vêxistin ser û çavên wê û melhefa wê ya spî reş bûbûn. Yeka qamdirêj û hestî qalind bû. Dev bi ken bû û dema dikeniya diranên wê yê hûr bi hev ve zeliqandî tim bala min dikişand.

Nizanim kengî bû, lê me hev li navenda partiya... nas kir. Got; "Navê min Turkan e." Min got: "Dayika Turkan, kê ev navê han li te kiriye? Ew jî kenîya û got: "Welch ez jî qet jê hez nakim, lê ka ez çawa bikim. Dema ez ji diya xwe bûme, bavê min li nav tirkan li leşkeriyê bûye û wê demê kalê min jî ev nav li min kiriye."

Dema min rojname dixwend, her tim dihat li ba min rûdinişt û digot: "Hevalê... ka rojname dibêje çi? Behsa girtiyan jî dike an na." Gelek caran jî bi min rojnameya Azadiya Welat dida xwendin. Min ta nivîs diqedand wê dev vekirî li min guhdarî dikir. Digot: "Binihêrin, zimanê me çiqas xweş e. Çi fêde ez nikarim bixwînim."

Yek caran, ji gazincên xwe dikirin ji dûrbûna Stenbolê. Kurê wê İrfan Çelik li Stenbolê girtî bû. Tevayî dinyayê li aliyekî, İrfan li aliyekî. Dema digot İrfan, hezar İrfan ji devê wê dibariyan. Digot:

"İrfanê min çûbû metropolan ji bo xebatê. Me sal û nîvekê tu xeber jê negirtibû. Me qet nizanibû ew li ku ye.

Hevalekî wî yê biçûktiyê jî taxa me hebû. Ev hevalê wî, rojekê dema rojnameyê dixwîne ku tê de navê İrfan derbas dibe, dibîne ku ew li Stenbolê hatiye girtin. Ew lawik hat mala me û ev nûçe da me. Ez rabûm çûm Stenbolê. Di Girtîxaneyê Umraniyeyê de bû. Ez dema cara pêşî çûm hevdiştina wî û çavên min bi wî ketin min got: 'Serkeftin be'. Wî jî bi kêfxweşiyekê bersiv da min got: 'Serkeftin be.'

Dema di çardehê gulanê 1997'an de ku dewletê bi hêzeke mezin êrîş kiribû ser başûrê Kurdistanê, ji ber ku li mala me MED-TV tunebû, keçika me ji bo nûçeyên MED-TV'yê temaşê bike, her êvarê diçû mala cîranê me. Êvarekê de-

ma bala xwe dide ku di nav nûçeyan de nûçeyek wiha derbas dibe: 'Girtiyê bi navê xwe İrfan Çelik li Girtîxaneyê Umraniyeyê Stenbolê jî bo protestokirina dagirkirina başûrê Kurdistan xwe şewitand.' Keça min hema li wê dibêje: 'Ev birayê min e.' Ew jina xwediyê wê malê jî radibe bi keça min re tîn mala me. Wan ev nûçeya han dan min jî. Dema ez bi vê berxwedêriya kûrê xwe hesiyam, dilê min ji kêfa dikir ku ji nav qefesa singê min bê der û bifire. Min hema di cih de dest bi lîlandinan kir. Xesûya min, pîra İrfan got: 'Çi bûye, çi qewimiye? Ew çima vê tilfî dikişîne?', jê re gotin: 'İrfan xwe li girtîxaneyê şewitandiyê.' Xesûya min çend lep li se-

rê min dan û ji xwe ve çû.

Wan çar-penc rojên pêşî, heçî kesên ku bi vê bûyerê hesiyam, nas û dost, xerîb û xomal, der û cîran tev de hatin serdana me. Di wan rojan de wekî ku li mala me dîlanekê gelek xweş hebe.

Paşê ku hatina mêvanên me hinek sist bûn, ez çûm Stenbolê. Ew rakiribûn Nexweşxaneyê Leşkerî ya Bayrampaşa. Ez bi gelek zor û zehmetiyan giham hundirê nexweşxaneyê. Dema ez çûm serdana wî, bi rastî jî gelek bi xedarî şewitî bû. Hew çavên wî û eniya wî bi tenê sax mabû. Du leşkeran li nava derê ew odeya ku İrfan tê razayî bû nobet digirt. Min bi devbikenî û moraleke bilind got: 'Ağirê serxwebûnê li bejna te pîroz be.' Wî jî bi eynî moralxweşî li min veşand. Me bi ken û kêfxweşî hal û xafirê hev pirsî. Me dema sohbet dikir wan herdu leşkerên nobedar ku li nav derî bûn, bi balkeşî em dişopandin. Paşê, wan leşkeran hatin ji min pirsîn gotin: 'Ev çi ye te ye?' Min got: 'Kurê min e.' Ew her du leşker şaş bûn. Li hev nihêrin û di me de metel û heyir man. Ji wan tirê, ezê li ser kurê xwe bigirîm û ezê li ber vî halê wî bivekim. Lê belê, wan leşkeran tiştek ji me fêhm nekirin û devê wan ziwa vekirî mabû. Tirseke bêwate di nava çavên wan de dixuya, vê helwesta me xofekê giran xistibû dilê wan leşkeran. Dema min xatir ji kurê xwe xwest û ez di derî derketim, wan leşkeran xwe dûrî min dan û hîn jî hişê wan nehatibû serê wan.

ROŞAN LEZGÎN



□ 31 berfanbar 1994:

Hêlin Başak Kanat hate kuştin

Di sala 1977'an de li Dêrsimê hate dinyayê. Li Edirneyê dest bi dibistanê kir. Başak; ji malbateke karmend bû. Di sala 1993'yan de temaşekirina listika "Mirin û Jiyana" jê re dibe sedema fêrbûna zimanê kurdî. Di heman demê de tevî nav xebatên NÇM'ê dibe. Di "Teatra Jiyana Nû" de bi listikên "Ta-Sê Ewrên Dûr", "Jinên Bîndest", "Gundê Xezê" û "Rojbaş" derdikeve hemberî hunerhezan. Di 31'ê berfanbara 1994'an de di dema rêwîtiyeke ber bi Stenbolê ve otobosa wan tê gulebarankirin û ew jî şehîd dikeve.

BÛYERINE JI DÎROKÊ

□ 8 Rêbendan 1984:

Necmettin Büyükkaya şehîd ket

Li Girtîgeha Leşkerî ya Diyarbekirê, rêveberiya girtîgehê bi hêzeke giran êrîş birin ser girtiyên ji doza Partiya Karkerên Kurdistanê. Di vê êrîşa hovane de, ji girtiyên Necmettin Büyükkaya şehîd ket, gelek ji wan jî birîndar bûn. Piştî vê bûyerê girtiyên zindanê ketin greva birçûbûn û mirinê. Di van protestokirinan de girtiyên bi navê Orhan Keskin û Cemal Arat şehîd ketin. Piştî re girtiyê bi navê Ahmet Bayık jî ji bo protestokirina van êrîşan xwe sewitand û şehîd ket.

Li NÇM'ê nîqaşa li ser Helbesta nûjen



"Helbest tenê ne bi hest û mêjî tê nivîsandin. Di nav mêjî û hestên mirov de, tîkiliyeke pir zirav heye. Divê ew tîkilî neqete û bi tu aliyê ve jî neçe. Di helbestê de divê maneya îmajê hebe û xwe di nav îmajê de biafirîne."



Ev cara sêyemîn e ku li NÇM'ê bi navê "Şevên Toreyê" çalakiyek tê lidarxistin. Şevên Toreyê wekî tê zanîn ji hêla xebatkarên Jiyana Rewşen; Kawa Nemir û Ibrahim Aydoğan ve tê amadekirin. Di çalakiya yekemîn de li ser Cigerxwîn û Osman Sebrî hatibû rawestî û helbestên bijartî ji temaşevanan re hatibû xwendin. Ji ber ku cara yekemîn bû hêviyek da me li ser edebiyata kurdî bê axaftin û bê nîqaşkirin. A duyemîn jî li ser 'di belavbûna zimên de rola rojnamegeriyê, rola medreseyan û edebiyata sirgûn a kurdî' hate sekinîn. Mijara ve mehê jî 'helbesta kurdî ya nûjen' û 'helbest çi ye, çawa tê nivîsandin rewşa edebiyata Başûr, Bakur û kurdên li Ewropayê çawa ye?' Li ser van jî bi awayekî hate rawestî. Her çiqas mijar diyar bû jî bi pirsên beşdarên tevlihev bû û encameke bi serkeftî nehate standin.

Li ser helbesta kurdî a nûjen Kawa Nemir dîtî û ramanên xwe anîn zimên. Li gorî Nemir jiyana helbesta nûjen li Rojava bêhtir hatiye bikaranîn. Bi piranî jî piştî Ronasansê, şairên rojavayî tiştên ku hatine serê wan dixînav helbesta xwe. Wekî din jî li Rojava pirdengî heye. Ev yek di helbestên wan de jî xwe dide der. Lê li Rojhilat tiştêkî wisa tune ye. Ji ber ku li Rojhilat jiyaneke nûjen tune ye.

Piştî gotinên Kawa Nemir, Ibrahim Aydoğan da zanîn ku mirov çiqas xweş biaxive û binivîsîne ew qas jî berhemên xweş diafirîne. Lê mixabin ji bo ku li ber zimanê kurdî astengî û qedexekirin heye ev yek zêde bi ser nakeve. Ku zimanê kurdî serbest bibe emê jî bi pêş-

bikevin û tiştên nûjen biafirînin. Her wiha Seydo Aydoğan diyar kir ku îro jî ber ku hinekî zimanê kurdî azad e, hin tiştên tene afirandin.

Li ser pirsê beşdarên, ku di kurdî de cihê helbesta nûjen çi ye; Seydo di bersiva xwe de bal kişand ser nûjentiyê û diyar kir ku divê nûjentî bersivê bide jiyana froyîn û her dem hemdem be. Cigerxwîn, Osman Sebrî, Qedri Can di nav klasîkê de nûjenî bi kar anîne... Helbest tenê ne bi hest û mêjî tê nivîsandin. Di nav mêjî û hestên mirov de tîkiliyeke pir zirav heye. Divê ew tîkilî neqete û bi tu aliyê ve jî neçe. Helbest bi tenê ne slogan û ne jî îmaj e. Di helbestê de divê maneya îmajê hebe û xwe di nav îmajê de biafirîne." Kawa Nemir jî bal kişand ser girîngiya ziman û diyar kir ku divê ziman ji nû ve bê afirandin, hunermend pêwîst e di nav civaka xwe de bi zimanê herî xweşik biaxive. Li aliyê din Nemir diyar kir ku kesên ziman baş dizanin jî nikarin bi kar binin.

Her çiqas navê bernamê Şevên Toreyê be jî jî aliyê beşdarên ve û li ser naveroka mijaran zêde tiştêkî balkêş derneket. Sedema vê yekê hem amadekarên bernamê hem jî beşdar bûn. Amadekar li ser gelek mijarên cur bi cur disekin. Mijarên ku mirov bi rojan jî nav derneyê di hundirê çend seatan de li ser tê axavîn. A duyemîn jî beşdar jî bo mijarê xwe amade nakin, gelek caran em dibînin ji bo pirsan 'bipirsir' dipirsin. Ev yek jî li ber serkeftina şevbûhêrkê dibe asteng.

ŞÊXMÛS ÖNAL

ÇAVDÊRÎ

Psîkolojiya xwe kêm û biçûkdîtîne



AMED TÎGRÎS

Di jiyandê de karê herî zor yek jê ew e ku mirov bikaribe xwe nas bike. Ji her alî ve bi çavêkî rexnegirî li xwe bimêzîne. Başî û xerabiyên xwe, kêmanî û serfiraziyên xwe bibîne, binixîne û bipîve. Wê demê mirov çi ye, çi nîn e, bi awayekî giştî derdikeve holê.

Di psîkolojiya komelayetî de, di vî warî de, gelek mekanîzma û metodên cur bi cur hene. Wekî mekanîzma xweparastinê, êrîş, xwe kêm û biçûkdîtîna û hwd... Ez dixwazim di vê nivîsê de hinekî behsa mekanîzmaya xwe kêm û biçûkdîtîne bikim.

Hinek kes hene ku doza zanabûn û mezinahiyê dikin. Xwedî nav û deng in an jî dixwazin bibin xwedî nav û deng. Filanê binî bavan... Lê kesên wiha di pratîka xwe ya kar de, ji derî çenebazî û pîrbêjiyê, tu tişt jî destê wan nayê. Ew di nav komele, civat, dem û dezgehan de mirovên bêkêr û bêhuner in. Kesên wiha ji hevalên xwe yê kar re dibin bar û barkêş û astengên mezin. Kesên wiha dixwazin ji hemû hevalên xwe bêhtir û qelîte-tir kar bikin, dil heye, lê huner û taqet nîn e. Ew tim li paş her kesî ne. Ew çiqas devbiken bin jî, lê di zikê xwe de xwe dixwin.

Dema ew kêmasî, bêkêrhatî û bêhunerîya xwe dibînin, naxwazin rastiyê qebûl bikin. Di rewşên wiha de, bi kesên wiha re mekanîzmaya xwe kêm û biçûkdîtîne dest pê dike. Li ser navê rexneyan, dikevin pozîsyoneke êrîşkar. Ew êrîş hevalên xwe yê xebatkar dikin. Ji hezar kaniyan avê tînin û bela ji bin lingên xwe û mirov dertînin.

Li gorî zanistiyê, kesên wiha, kesên bêbalans (bêhawe) in. Tu carî du demên wan hev û du nagirin. Mirov nîzane kengî baş in û kengî jî êrîşkar in. Di demeke gelek kurt de, rewşa wan a psîkolojîk dikare 180 derece bê guhartin. Carinan bi demeke gelek kurt de, ne 180, 360 derece rewşê guhartin.

Ev çawa dibe?

Ew wiha dibe: Dema 180 derece rewşê guhartin dikeve rewşêke li dijberî rewşa xwe ya pêşî. Yanî bi aram bin, êrîşkar dibin, êrîşkar bin, bi aram dibin. Lê di rewşa 360 dereceyê de, zû bi zû poşman dibin û ew tiştên ku çend deqîqe berê gotibûn mikur lê ten an jî wekî ku qet tiştêkî wiha negotibin tevdigerin. Li vir xaleke girîng heye û divê baş bê zanîn ku çerxa 360 dereceyê ne ji bo her kesî ye. Ew jî bo ew kesên berpirsiyar an jî payebilind e. Ev jî li ser navê dîsîplîn û rêzgirtinê tê qebûl û hesabkirin.

Belê, analîza psîkolojîk ev e, lê çareserî çi ye?

Ji bo kesên bêterfî û bêrutbe ku bikarin xwe li hemberî kesên wiha biparêzin hezar mixabin bi tenê riyek an jî alternatîfêk heye. Ew jî divê mirov her dem hişyar be. Bi nişan û sînyalên 180 dereceyê re, divê bi lez û bez hîn ku agir bi qot neketiye, divê mirov cih û warê xwe bihêle û bireve.

Bele, dê mirov çawan bizanibe nişan û sînyal çi ne ku mirov xwe ji bo revê amade bike?

Malneket ma ev jî pirs e? Heger mirov demeke hew qas dûr û dirêj bi hev û du re kar bike na bibore, min ji bir kir, jixwe ji bo ku kar ji destê kesên wiha nayê, ew xwe jî êrîşê re amade dikin—êdî bê axaftin bi jêst û mimikan jî, mirov ji hev û du fêr dibe. "Here lo, tu çiqas jî serhişk î û gotin bi serê te de naçe?" Baş e ez ji te re çend sînyalên sor û xetere bêmî, ka guhdarî bike.

Dema gotin were em civînê çêbikin, sohbetê bikin, kongre çêbikin an jî were em herin çayêkê vexwin... cixarekê bikîşînin, tu bizanibe ku wê demê alarm heye, lamba sor lê dixê. Heger çenteyê te heye, wî bigire û heger çenteyê te jî tune, çaketê xwe bigire û li pey xwe mêze neke û heta tu dikarî bireve. Lê bi baldarî di derencayan re here, tu dikarî bikevî û stûyê te jî bişikî ha! Lê li peyî xwe mêze neke!

Serokê HADEP'a Sêrtê Veysel Turhan: Divê HADEP xwe ji bo şertên giran amade bike

We li Sêrtê kengî şaxa HA-DEP'ê ava kir?

✓ Di sala 1995'an de, di meha 21'ê gelawêjê de, me partiya xwe li Sêrtê ava kir. Dema ku me li Sêrtê şaxa partiye ava kir, me gelekî zehmet kişand. Heta dewletê da xwe ku min bikuje. Fersend nedidane me ku, em partiye ava bikin. Lê me gava xwe bi paş ve neavêt.

Tiştê ku ew hêz da we çi bû?

✓ Baweriya me bi doza me heye. Em neteweyek in. Mafên me yên neteweyî ji me hatine standin. Em ji li heyinê xwe xwedî derdikevin. Lewre em kurd in.

Li Sêrtê têkiliyên gel û partiyên siyasetê çawa ne?

✓ Têkiliyên gel bi HADEP'ê re gelekî baş in. Têkiliyên me germ in.

Pivana vê germahiyê çi ye?

✓ Kêm be ji HADEP daxwazên gel bi cih tîne. Ji ber vê yekê li dijî zilmê ku li ser wan tê kirin, derdikeve. Ji aliyê din ve HADEP li nasnameya wan xwedî derdikeve.

We di nav axaftina xwe de qala daxwazên gel kir. Li Sêrtê daxwazên gel ji we çi ne?

✓ Hêviya gelê me yê Sêrtê ji partiyên birjuwaziyê nemaye. Wan, heta niha tiştên ku gotine bi cih neanîne. Di milê aborî û civakî de tu guherandin çênebûne. Pirsgerêkên herêmi safî nebûne. Lewre gelê Sêrtê HADEP'ê ji xwe re wekî hêviyêkê dibîne. Dizanin ku HA-DEP diziyê nake, dek û dubareyan nake. HA-DEP di fikir û ramanên xwe de ji dil e. Wekî minak sibê em dixwazin di belediye de kar bikin. Gel dizane ku emê bêhtir sûxreya (xizmet) wan bikin.

Di hilbijartinê de ihtimala qezenkirina rêveberiya belediyeyê heye? Ji ber ku Sêrt ji aliyê şeniya xwe ve bajarekî tevlihev e...

✓ Belê rast e. Qismek ereb ji hene. Lê ev ji bo me nabe asteng. Têkiliyên me bi gelê ereb re ji hene. Jixwe ew çiqasî me nas dikin, hew qasî tevî me dibin. Di navenda Sêrtê de partiya yekemîn em in. Avantaja me ji partiyên din bêhtir e, lewre em hin tiştan tinin zimên. Ev yek ji heye, dema em bibin desthilatdar gelê Sêrtê ji dibê desthilatdar. Gel di vê fêhm û zanebûnê de ye. Yek asteng heye, ew ji dewlet e. Her wiha ne tenê li navenda Sêrtê, li derdora Sêrtê ji partiya yekemîn em in. Her çiqas dewlet ne bi awayekî hiqûqî bi ser me de bêtir, em hêvîdar in ku emê bi ser bikevin. Niha sêzde belediyeyê Sêrtê

hene, em di wê baweriyê de ne ku %70 emê bi dest bixin.

Sedemên van êrîşan çi ne? Hûn gelekî dixebitin an gelek endamên partiye hene, hûn dikarin vê yekê hinekî zelatir bikin?

✓ Ev tiştêkî dîrokî ye. Ji avakirina Komara tirk hetanî vê gavê xwestine ku kurdan ji holê rakin. Mirov nikare Sêrtê ji vê yekê cuda bifikire. Rewşa Sêrtê ya kozmopolît heye. Dewlet dixwaze gelê kurd û ereb li dijî hev sor bike.

Bi qasî ku em dibînin mafê jiyane yê hin ereban ji kurdan bêhtir e. Bi vî awayî em bandora ereban li ser kurdan dibînin. Wisa ye an na?

✓ Belê derfetên wan bêhtir in. Ev yek ji mesela aborî ye. Niha, berî sala 1980'ê yî li Sêrtê kurd tunebûn. Kurd ji gundan hatine û ketine navenda Sêrtê. Sêrt wexta ku bûye bajar, dewletê bi zanebûn ev tişt kiriye. Sêrt ne cihêkî wisa ye ku bibe bajar. Ji ber ku tevî xwerû ereb in, kirine bajar. Bêguman ev yek politikaya dewletê ye. Dewletê Sêrt kiriye navenda bazirganiyê. Ji ber wê yekê gundî mecbûr mane ku biçin Sêrtê. Wê li Sêrtê çi bikin? Wê malê xwe bifiroşin, wekî din ka çi pêdiviyê wan heye, pêlav (sol) e, fistanek e û cilek e. Ka bê çi ye bistîne û here gundê xwe. Îro li Sêrtê rewş guheriye, piştî ku kurd hatin ketin navenda Sêrtê bandora wan li ser bazirganiyê çêbû. Li ser kar û xebatên wê derê çêbû.

Niha bi giştî rêveberiya herêmkî li Sêrtê di destê kê de ye?

✓ Niha li Sêrtê belediye di destê ereban de ye. Ji sala 1993'yan vir de. Wê demê DEP hebû, em neketin hilbijartina belediyeyê. Ji ber wê yekê ereban ji bi piştigiriya kurdan hingî belediye xistin destê xwe.

Vê gavê navbera we û serokê belediyeyê çawa ye?

✓ Têkiliyên me bi belediye re hene. Her wiha bi daîreyên fermî yên din re ji têkiliyên me hene. Ew dizanin ku hin pirsgerêkên Sêrtê, HADEP baştir tîne zimên. Lewre serokê belediyeyê çend caran bi rîya telefon û nameyan spasiyên xwe pêşkêşî me kirin. Xwe bi awayekî eşkere nêzîkî me didin xuyakirin. Lê dema serokê me yê giştî 23'yê sermawezê hate vê derê rûyê wan ê rastîn derkete holê. Armanca wan tengkirina çepera li dora HADEP'ê ye.

Navbera we û partiyên li Sêrtê çawa ye?

✓ Têkiliyê me bi wan re çêdibin ne ku çênabin. Di hinek meseleyên civakî

de em gelek caran li hev civiyane. Feqet rastiyekek heye. Tu pirsgerêkên wan ên civakî tune ne. Gel perçiqiye, talan bûye, birçî maye ne xem wan e. Me hinek ramanên xwe ji wan re anîn zimên. Me got fikir û ramanên me ji hev cuda ne, lê hinek tişt hene ku em hemfikir in. Eger di nava Sêrtê de herî hebe, toz hebe, nexweşî hebe, riyên me neçêkirîbin ev pirsgerêkên me tevan in. Em li ser van tiştan hevkarîyê bikin. Lê ji ber ku ew bi dewletê ve girêdayîne, xwe ji me dûr dixin. Ew, ne bi îradeya xwe tevdigerin. Vê yekê ji di 9'ê meha rezberê de xwe bi awayekî zelal eşkere kir. Wekî hûn ji dizanin serokwezîr hate Sêrtê. Beriya ku

tan de texdîr ji kir. Walî li ser zilmê, valakirina gundan, qedexekirina zozanan pirsên me bersivandin.

Bersivên walî bi çi awayî bûn?

✓ Fêhma dewletê bû. Walî got, "Çend terorist tên me dikujin, em ji mecbûr in wiha bikin. Hemû gund li ser vê munasebetê hatine valakirin."

Têkiliyên we bi gundên Sêrtê re çawa ne?

Têkiliyê me bi gundan re kêm in. Li gelek cihan partî ava nebûye. Li Misirê û Baykan şaxên HADEP'ê hene. Li wan deran têkiliyên me xurt in. Cihê ku em nikarin biçinê, gundî xwe digihînin me. Em bi rehetî nikarin li welêt bigerin, li ber me dibin asteng. Li gorî kêfa xwe bi saetan dikarin me di rîyan de bisekinînin. Cerdevan ji me aciz in, ne ku em ji wan ditirsîn, lê ji me re dibin asteng. Ji aliyê din ve saziya me zêde ne qewîn e. Rêveberên me ne zêde zana ne.

Em dixwazin pirsgerêkên we yên di nav partiyê de hîn bibin. Çi ne pirsgerêkên we?

✓ Fêhma heyî ne

Li Sêrtê insan ji nû ve li ziman xwedî derdikevin. Berê zimanê kurdî di warê aborî û siyasî de qels bû. Lê îro mirovê me têgihîştine ku zimanê kurdî di warê edebî, siyasî û felsefî de pêwîstiyên wan bi cih tîne.



serokwezîr bê, waliyê Sêrtê bi partiyên siyasî re civînek li dar xist. Serokên belediyeyên navçeya Sêrtê û hinek midûrên wan ji di nav de nêzîkî sed kesî beşdarî civînê bûn.

Di rojeva civînê de çi hebû?

✓ Walî dixwest ku ka pirsgerêkên Sêrtê çi ne ji devê me teva bibihîze û li ser navê xwe pêşkêşî serokwezîr bike. Walî mafê axaftinê da hemû partiyên. Mesela nûnerê BP'ê rabû û got, "Me terror tîk bir." Yanî xwe bi walî şêrin kir. Hinek bazirgan ji der barê krêdiyan de axivîn. Kesî qala meseleya esasî nekir. Di wî warî de bi tenê me haziriya xwe kiribû. Me qala pirsgerêkên tendurustî, perwerdehî, civakî û valakirina gundan kir. Di wî warî de walî em di hinek tişt-

bes e, têrî saziyê nake. Têrî politikayê nake. İnsanên me rêveberên me di siyasetê de nepijiyayî ne. Ji ber ku ne pijiyayî ne fêhma wan teng e. Di warê têkilîdanînê de zehmetiyan dikîşînin.

Asta perwerdehiya rêveberên we çi ye?

✓ Di nav me de kesên ku lîse an jî dibistana bilind xwendine kêm in. Ez bi xwe ji lîseyê mezûn bûme. Serokê navçeya me jî ji zanîngeh xelas kiriye. Hevalên me yên din jî dibistana pêşîn xwendine. Esas ez vê yekê bi xwendinê ve girê nadim. Em dibînin yên xwende jî dema dikevîne nava siyasetê nikarin karûbarê siyasî bikin.

Navbera rêveberan û gel çawa ye.

✓ **Kurdên ku ji ber zilm û zordariya dewletê reviyane û hatine Sêrtê niha piraniya wan derbasî metropolên mezin bûne. Hinekê wan dixwazin vegerin gundên xwe. Naxwazin ji axa xwe, ji keda xwe biqetin.**


Hêvi û daxwazên gel bi cih tînin an na?

✓ Em nikarin bibêjin ku ji her alî ve serkeftî ne. Rewşa wan ji bo gel ne bersiveke têr tiştî ye. Rêveberên me ne di rewşeke wisa de ne, ku em plan û projeyan bidine ber xwe politikayê kifş bikin. Kêmasiyên gelekî mezin hene. Lê li gorî zanîna xwe tiştên ku ji partyê hîn bûne dikare pêşkeşî gel bikin.

Dema ku bersiveke baş nede, gel pirsgrêkên xwe çawa çareser dike, gel Sêrtê ve yekê çawa dinirxîne?

✓ Belê gel vî tiştî dibîne. Gel, me jî baş nas dike. Bi rastî hêviya gel ji rewşên birê ku di

H A -



DÊP'ê de kar bike, heye. Lê ev kes xwe didin alî. Ev kar dikeve ser milê me gundîyan. Em gundî jî bi qasî fêhma xwe emê vî karî bimeşînin. Gel dizane ku rêveberên me dikarin çiqas kar bikin. Pirsgrêkên malbatî kêmbin jî, çareser dikin. Lê di aliyê siyasî de bersiva gel nadin.

Ji ber rewşa Sêrtê ya taybet dema hûn biryaran digirin, bi pirsgrêkên çî rengî re rûberî hev dimînin?

✓ Ji ber politikayên dewletê, biryaran ku em digirin, gelek caran nakevin jiyane. Dema ku em biryaran digirin hinek kes xwe ji me dûr dixin, lê hinek kesên din xwe ji bo her tiştî amade dibînin. Dema jî çî biqewime bila biqewime. Ji ber tiştê ku em wînda bikin niyame.

Ew xwe êşkere îfade dikin. Li me û biryarên me xwedî derdikevin. Lê ev jî heye di vê rewşa awarte de meşandina politikayê ne karekî hêsan e.

Belê asta xîzaniyê çî ye li Sêrtê?

✓ Bi rastî feqîrî zêde heye li Sêrtê. Wekî mînak dewletê qazeya Eruhê (Dih) vala kir. Ev însan jî kedê qetiyan. Yanî jî hilberînê (ûretim) dûr ketin. Însanê jî kedê biqete wê birçî bimîne, feqîr bikeve. Ji ber vê yekê Sêrt di rewşeke xerab de ye. Dewlet nahêle ku gundî herin heywanên xwe xwedî bikin. Zozan qedexe ne. Li ser hinek gundan hê jî ambargo heye. Arvan, rûn û şekir bi kîloyan tên firotin. Dewlet li hin gundan hin sînor kifş kirine û dibêje "Tu dikarî pênc sed an jî hezar metreyî ji gund dûr bikevî û heywanê xwe biçêrî."

Dewlemendên herêmê çawa li vê rewşa xîzanan dinirxînin? Piştgiriyê dikin an na?

✓ Heta niha me nedîtîye. Em nikarin bibêjin ku li van însanan xwedî derdikevin. Hal û wextê wan dipirsin, hinekî dibine şirikê kederê wan. Fêhmeke giştî heye. Ew fêhma bazirganiyê ya Stenbolê di Sêrtê de jî heye. Fikir û ramanên wan ne li ser însanan e. Mirov birçî mane, nexweş ketine, ew jî bo wan ne xem e. Heta jî wan tê, bi pey îmkânên dewletê dikevin. Di pey îxaleyan de baz didin. Dewlet wisa alikariya her kesî nake. Febrîqeyê ku emê heywanan çedikir, hebû. Dewletê ew di sala 1993'yan de bi milyarekê firot. Firo-

te hevalbendê xwe. Helbûkî buhayê febrîqeyê wê demê ne kêmbi penci milyarî bû. Lê em bawer in ku ew kesê ku bi milyarekî febrîqeyê kirî ne tenê bi milyarekî, bi deh milyaran jî daye hin cihên din. Dewlet berî ku kesên îhaleyê qezenc bikin, diyar bike li ser jiyana wan mirovan lêkolînan dike.

Ji aliyê tenduristî ve rewşa mirovên li herêma Sêrtê çawa ye?

✓ Meseleya tenduristiyê jî meseleyeke girîng e. Bi rastî hemû tişt bi hev ve girêdayî ne. Ji aliyê tenduristiyê ve rewşa Sêrtê ne baş e. Nexweşî heye, di nav zarokan de. Zêhftir nexweşiya tifoyê peyda dibe. Ev jî jî ber şert û şirûten qirêjî çêdibin. Wekî din însanê me ku jî kanserê dimirin jî hene. Car caran kole-

✓ **Her çiqas hin nexweşiyên me hebin jî, ev jî ber şexsan e. Divê em politikayê wiha bikin ku dewlet me neêşîne. Ev tiştên xelet in, em çî politikayê bikin jî wê dewlet wekî xwe bike. HADEP lazim e bi xwe ewle be, bi xwe bawer be.**

ra jî peyda dibe. Dewlet behsa van tiştan nake, ev tişt ne xema dewletê ye. Nexweşxaneyek daniye; ya dewletê û ya sîgortayê. Li wan deran jixwe tu xizmet nayê kirin. Heta jî destê doktoran tê, nexweşan dikişînin yazîxaneyên (nivîsgeh) xwe. Ji bo ku têr pere ji wan bistînin. Meseleya tenduristiyê bi tevahî bûye meseleya bazirganiyê. Doktorek jî bo fêhma însanî kar dike nîn e. Însanên me jî feqîr in, yê ku pereyên wan hene, pirsgrêkên xwe yê tenduristiyê çareser dikin. Lê yê ku derfetên wan tune ne wekî xwe dimînin.

Kurdên ku koçberî Sêrtê bûn, rewşa wan çawa ye. Niha bi giştî li Sêrtê dimînin an na?

✓ Kurdên ku ji ber zilm û zordariya dewletê reviyane û hatine Sêrtê niha piraniya wan derbasî metropolên mezin bûne. Vêga pir hindikê wan li Sêrtê mane. Hinekê wan dixwazin vegerin gundên xwe. Naxwazin ji axa xwe, ji keda xwe biqetin. Her çiqas li bajar bin jî li hemberî tade û zilmê bin jî, xwe digihînin gundê xwe bi vê niyetê li gundê xwe xwedî derdikevin. Lê ji aliyê din ve nêzikî bist hezar hîlbijêr jî Sêrtê derketine. Bifikire, nêzikî 70-80 hezar însan jî Sêrtê koçber bûne. Ev hejmareke mezin e. Hemû însanên kedkar in. Lê betal in.

Piştî van yekan ji me nayê ku em bipirsin, lê dîsa jî dixwazin hîn bibin. Têkiliyên gelê Sêrtê bi çand û hunerê re çawa ye. Xebatên bi vî rengî hene an na?

✓ Çand û huner tiştêkî zêhftir girîng e. Dema bîngeh tunebe, ez bawer nakim ku xebatên çand û hunerî pêk bên. Derfetên me jî nîn in, car çaran di partyê de ciwanên me kurte-şanoyan û konseran çêdikin. Lê dewlet gelek astengiya ji bo van tiştan jî derdixe. Sendîqeya Egitim-senê xwest ku şanoyekê pêşkeş bike. Lê dewletê destûr neda. Dibistana çand û hunerê tune ye. Bêdibistan zehmet e. Hele di nav vî şerî de karê çand û hunerê gelekî dijwar e.

Ji bo ku mirovên li Sêrtê dijîn, têkildarî çand û hunerê bibin, divê çî bêkin?

✓ Divê her kes li MED-TV temaşê bike. Hatiye ketiyê mala me. NÇM di warê folklor, şano û muzîkê de gelek xebatên heja dike. Her çiqas em nikarin ji van xebatan fêde wergirin jî em dikarin ji berhêmen NÇM'yên nivîskî fêde wergirin. Her wiha divê kurd bi zarokên xwe re bi kurdî bipeyivin. Bi tirkî nizanin bi zarokên xwe re tirkî dipeyivin. Ev tiştêkî çewt e. Ez dixwazim mînakekê bidim, "Dema şerê duyemîn a cihanê artêşa nazîyan gava Fransayê dagir dike, mamosteyekî fransî jî xwendekarên xwe yê zarok re wiha dibêje: "Alman hatin

ku welatê me dagir bikin û wê zordariyê bikin hûn çî tiştê xwe wînda bikin jî, zîmanê xwe wînda nekin."

Niştecihên Sêrtê bi piranî kajan zîmanî bi kar tînin?

✓ Berî her tiştî ez dixwazim spasdari û hurmetiya xwe pêşkeşî dayikên kurd bikim. Heger jî wan nebûya min niha kurdî jî bîra kiribû. Em zêde lê xwedî derneketin. Li Sêrtê însan jî nû ve li zîmanê xwe xwedî derdikevin. Wekî berê jê şerm nakin. Berê zîmanê kurdî di warê aborî û siyasî de qels bû. Lê îro mirovê me têgihîştine ku zîmanê kurdî di warê edebî, siyasî û felsefî de pêwîstiyên wan bi cih tîne.

Ji bilî tirkî bandora erebî li ser kurdî heye?

✓ Kurdê ku beriya salên 1980'an koçî Sêrtê bûne xwe mecbûr dîtine ku hînî erebî bibin. Bi vê nemabûn, dev ji tirkî ber dabûn bi erebî mijûl dibûn (dipeyivîn). Lê hejmara wan kesan gelekî kêmbû. Piştî ku hejmara kurdan li Sêrtê zêde bû, bandora erebî bi tevahî ji holê rabû. Kes hewcê nabîne ku bi erebî bipeyive. Îro di daîreyên dewletê de jî em bi kurdî dipeyivin.

Zarokên kurdan bi giştî bi kajan zîmanî dipeyivin?

✓ Bi giştî bi kurdî dipeyivin. Ji ber ku diçine dibistanê jî mecbûrî bi tirkî dipeyivin. Lê di vê navberê de ereb jî hînî kurdî bûne. Îro em dikarin bibêjin hemû ereb bi kurdî dizanin.

Li Sêrtê eleqeya gel ji bo weşanên kurdî çawa ye?

✓ Tengasiyek heye. Însanên me dipeyivin lê dema dinivîştin an jî dixwînin zehmetê dikişînin. Hin hene xwe pêş dixin. Ferhengan distînin, lêkolînan dikin, rojnameyê dixwînin. Lê însanên me yê di vê fêhmê de kêmbin. Ne ku bi kurdî naxwîne, bi tirkî jî naxwîne. Bêleqetiyek jî bo xwendinê heye.

Di van demên dawîn de hin rexne li HADEP'ê tên kirin. Li Sêrtê gel ve yekê yanî HADEP'ê çawa dinirxîne?

✓ HADEP lazim e bizanibe li ser piyê xwe bisekine. Bikaribe politika xwe kifş bike û bimeşe. Her çiqas hin nexweşiyên me hebin jî, ev jî ber şexsan e. Em dibêjin divê em politikayê wiha bikin ku dewlet me neêşîne. Ev tiştên xelet in, em çî politikayê bikin jî wê dewlet wekî xwe bike. HADEP lazim e bi xwe ewle be, bi xwe bawer be.

Madem ku em partyeke siyasî ne û gel jî bawerî daye me, heger ku tiştêkî nemîne, emê xwe bişewitînin. Ez vê dibêjim, lê ne ku bibe gotin. Ez jî dil û can vê dibêjim. Lazim e çî bê pêşiya me, em wê bikin. Divê HADEP xwe jî şertên giran re amade bike.

HEVPEYVÎN: AZAD ALTUN

Destpêkirina dibistana seretayî

Wekî iro tê bîra min, rojên zarokatiya min. Tevî kiras û derpê min timî çarox dikir pê. Hejmara xwişk û birayan ji ber ku pir bûn, hîna jî nayê bîra min. *Gundê me gundekî şên bû*
Tev maldar bûn.
Xizanî li wê kêmbû
Zarok bêlîstik nabîn
De haydê zarino rabin

Bir, zixt, darqîtik, kap, turb turb hêlik û qoqle qazî. Mewatên golikan moz dikir. Dayikan dikir gazî. Baz de li pey golikan, striyên xweristê diketin piyan. Roja diçûm ber berxikan, gunehê min bi wan dihat. Min vedikir bizmikan. Rojêkê min nan bire cot, bavê min li wê derê got: "Êdî tu mezin bûyî, ji xwişk û birayên te kesekî nexwend, te qeyd dikim dibistanê. Lê li gund dibistan nîn e, wê kalê te bê, here li navçê bixwîne." Ez li wê derê giriyam. Qeyda hespê me yê boz ket bîra min. Dilerizim û diricifim. Bavê min got: "Çima digirî lawê min?" Min got: "Bavo ez ne hesp im, qeyd nabim. Ez naçime dibistanê."

Min li gayê beşo nihêrt
Ew jî di bin nîr de.
Kûr û dûr difikiri
Wan çavên wî yên reş
Şil bûbûn, bawer bûm
Beşo ji bo-min digirî


Rojekê li navçeyeke dûr, gotin mêvanekî we hat. Qurpînî bi dil ket, kalo hat. Bazdankî çûme malê. Min nihêrî li bejn û balê. Ramûsim destê kalê. Girêdana wî ne wekî ya gundiyan, kî dihat ji ber wan ra dibû piyan. Bû sibe, em bi rê ketin. Di rê de, min di dil de, xatir dixwest ji gund. Ji devî û zeviyân, ji ajal û heywanan, ji xwişk û birayan, ji berxik û karikan. Lê qeyda dibistanê û hespê boz tu car ji hişê min naçin der. Em gihîştin Farqînê. Siwar bûn li makinê. De here Bênav here, êdî kî te bi bir tîne! Ji pirekê derbas bûn, ketin nav dar û deviyân. Kifs bû li wê xweş bû jiyân. Gotin vira şaristan. Kelên reş û bi derî, daketim ji makinê, bûbûn wekî termê bêserî. Wax, wax, wax!.. Ev qas mexlûqat heye. Berjêr û berjor digerin. Vî serî û wî serî. Şinge şingek tê, şerbet, şerbet. Kalo got: "Ey şerbeta biyan e, ku bê vexwarin, dermanê rih û giyan e. Ji jiyânê re derman e."

Hespê wan ne bezan in
Bi loq loqê diçin
Di ber faytonê de
Dengê nala wek stran e.

Em çûne cihekî, gotin ev der taşxane (aşxane). Mase û kursiyên bilind her yekî tiştêk anî, tev li ber me danîn, kevçiyên darîn nîn bûn, tas û lenger ji nîn

bûn, gotin ev e guveç. Çi guveç e, tirşik bû tirşik. Dilê min bi wan kîn bû. Ji peyva guveçê xeydîm, min nan nexwar. Bi zimanekî dipeyvîn jê re digotin tirkî. Kes nedipeyivî bi kurdî. Gotin nan bixwe: Ev çi bû hat serê min? Li ku me ka dê û bav. Mehîr hate bîra min. Heta ji min hat, min kir gazî. Ji min re mehîrê bînin, mehîrêê!.. Lê mehîr nehat hawara min... Bi zikê xweyê birçî, Bênavo tu bi ku de diçî?

Li pikabê siwar bûn
Bi min re bi kurdî nepeyivî Amed
Em ji deştê derbas bûn
Ketine nav çiyayan
Riyekê ne xweş
Pikabê dikire xirçexîrç
Em li cihekê westiyân



Gotin navê vira Lîce
Êdî riya me ne dûr e
Navçeya emê herinê
Ne Qulp e, Pasûr e
Demsal payîz, sal
Hezar û nehsed û şeşt e
Pasûr amade be
Deştiyek tê te.

Çend roj wekî biyanan, di mal de, li kolanan, li der û doran geriyan. Hawîrdor bi min, dan nasîn.

Pasûr
Di quntara çiyê de
Her du çavên te
Yek Dêlît yek Şafîrnût
Her du milên te
Çemê Şekira û Çemê Pasûr
Eniya te
Wekî kendalê hêşîn, naqermeçe
Porê te.
Wek çiyayên Andokê spî dîke
Neynika te
Kevirê nivîsî û kevîrê kelê.
Tika min ji te Pasûr

Bi min re bi kurdî bipeyive.

Min çend rojan bêhn veda. Qeyda min çêkirin. Li dibistanan seretayî. Roja yekemîn, zarok li ber dibistanê, dengê zengilê beranan hat. Zarok li hev civiyân, ref bi ref rêz bûn, ez birim refê yekan. Mirovekî çavhêşîn, hat ber refan, dest helanî û oriya... Paşê zarokê derket, wî got çî, lê hat fetilandin. Wek kerên me meriyan. Ez fikirim; Orîna gayê beşo ku dihat, birçî bû, em dixwest. Lê borîna wî yê çavhêşîn, min qet tiştêk jê fam nekir. Marîna karên me ku dihat, dayikên xwe diditin, şîr dixwestin. Lê berîna wan zarokan, min qet tiştêk jê fêhm nekir.

Em çûn hundîr, gotin ji vira re dibêjin sinif. Derî vebû, hat yekî serkundîr.

xwe bi bir anî. Ketim xem û xeyalan.

Ez ji qeydê rizgar bûm
Ketim nav dafa tirkî
Wekî berxan
Êdî dev bi bizmîkî
Ka wê kî bipeyive bi min re bi kurdî
Ev zimanê me yê xweş.
Çima ji bajariyan re
Bûye reş.

Ku gurdî bihatana navçeyê, bipeyivîyana bi kurdî, niştêcîhên navçeyê, hiriyo hiriyo dikir, bi tinaz û henekan ji dijmin re kar dikir. Wan rojên wek dojhê, li mal û li fêrgehê, li kolanan li sûkê, ne him ne jî gim. Bûm sêwiyê ser tenûr û bermalan. Bûm wekî kerelalan. Pîr hebûn fenanî min, yên ku nizanibûn bi tirkî, ew jî bûbûn hevalê min. Gotinekê bi kurdî, kû ji devê me dipeki, sixûrên di nav me de wekî Silêmanê Dunîkil, diçûn ba serkundîr, jê re gilî dikirin. Mamostayê serkundîr wê em bibirina hundîr, ew şivên wî yên ter, yek ji min re, yek ji te re, yek ji wî re. Dest sor dibin, ji neynûkan xwinê diavêt, ji şîmaqaqan êşê diavêt guhan. Em ji ber dibûne ker. Paş ve em dişandin malê, ji bo diravên tawanê. Roj hebû carekê du caran, me bi kutanê, qutiye bi dirava têra dilê xwe dixwar.

Rojek dîsa li fêrgehê
Ez li erdê ketim
Bi rastî ez êşiyam
Bi kelegirî
Min gotiye dayê dayê
Serkundîr pê hesiyaye
Gote min
Te çima ne got ana?
Wey hayê hayê hayê...
Kanik di dev de ye

Pev re rabûn ser piyan, jê re digotin mamosta. Dest bi navxwendinê kir, dor hate ser min. Ji min re got: 'Kalk'. Min li dora xwe nihêrt, min jî jê re got: "Kalk". Gote min: "Gel buraya oxlim" Min jî re got: "Gel buraya oxlim." Gote; 'Otur', min jî re got; 'Otur'. Bi Ehmedo re peyivî, Ehmed hat di guhê min de bi kurdî, bi dizî bû wergêr. Bi kurmançî nepeyive; çima qe tu nizanî, tirkan li ser zimanê me yê zikmakî qedexeyî danî. Tu bipeyivî bi zimanê dayika xwe, binêr waye qutî bi dîwêr ve ye, tu yê bidî cezayê xwe. Tawan li gorî car û peyvê ye. Bîst û pênc dirav û qutiye ye.

Dawî li rojê hat
Perşikandî stûxwar
Çûm malê ponijim
Gotin ev çima bêmade ye
Min got li dibistanê
Kurmançî qedexe ye.

Gotin rast e. Ji bo fêrbûna tirkî, li mal jî wekî dibistanê, qedexeyek mezin danîn. Ez ketima nava ciyan, min gundê

Wekî ajalan dikaye
Encama peyva dayê
Bizanibin êdî
Min bi çî daye
Bi çî kul û bi çî halî
Dibistana pênc salî
Min dawî lê anî
Nivîsên bi zimanê tirkî
Mêjî tiştêk jê hilnedianî
Gelo çî dibû dibistan
Bi kurdî jî hebûya
Kutan û lêdan
Ji bo me nebûya

Ji qeyda dibistanê, min pir caran heft xwezî bi qeyda hespê boz dianî. Mirov dibe dijminê çand û zimanê xwe...? Mêjiyên teva genî bû, dêmek bişaftin bi vî terhî ye, mirov dikin fenanî xwe.
Bi tenê gayê beşo
wê rojê
Dizanibû pêşeroja min
Lewma hêstir jî
Çavên xweyê reş dianîn.

Li NÇM'ê ya Stenbolê

● 27.12.1997 Şemî: Teatra Jiyana Nû: "TA' Sê Ewrên Dûr", saet:14.00

TA' Sê Ewrên Dûr: Ji sê perdeyan pêk tê. Perdeya yekemîn li ser jiyana rewşenbîrekî kurd ku li metropolê dijî, perdeya duyemîn, feodalîzma li welat, perdeya sêyemîn, jî li ser kesên tawanbar rawestiya ye. Tiyatro

Jiyana Nû niha perdeya sêyemîn nalîze.

● 28.12.1997 Yekşem: Konsera Hoza Hogir, saet:17.30

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



Li BEKSAV'ê

● 02.01.1998 In: Film: Li Culemergê Dansalek, derhêner: Erdem Kral, saet:18.30

Li MED- KOM'ê

● 28.12.1997 Yekşem: Panel: Helsegandina sala 1997'an ji bo kurdan.

Li NÇM'a İzmirê

● 27.12.1997 Şemî: Konsera Koma Azad, saet:18.00

● 30.12.1997 Sêşem: Konsera Berfina Besta, saet:18.00

Civîna sazkirina rastnivîsa kurdî pêk hat

Wekî diyar e, ev demeke dirêj e, ku Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê li ser ziman, zargotin û çanda kurdî xebatên xwe didomîne. Van rojan jî der barê dîroka edebiyata kurdî û zimên de qursek didome.

Roja 20'ê berfanbarê jî li Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ji bo yek-kirin û sazkirina rêziman û rastnivîsina kurdî civînek hate lidar-

xistin. Civîn bi rêveberiya Cîgî-

rê Serokê Înstîtuya Kurdî

Hasan Kaya pêk hat. Di

civînê de Yakup Kara-

demir (MED-KOM),

Fehim Işık (Rojna-

meya Hêvî), Ali Ka-

radeniz (Nûbihar),

M. Habib Çinar

(Weşanên Doz), ji

Rojnameya Azadiya

Welat Gerîndeyê

Gîştî Sami Tan, ji

Weşanxaneyê KO-

MAL'ê Nevzat Sağnıç, ji

Kovara Jiyana Rewşen I.

Seydo Aydoğan û li ser navê

Navenda Çanda STRAN'ê Behçet

Epözdemir beşdar bûn. Her wiha di civînê de

Feqî Huseyn Sağnıç, Torî û Zana Farqînî jî di-

tin û ramanên xwe der birin.

Di beşa yekemîn a kombûnê de, li ser girîngiya kombûnê hate rawestîn û hemû beşdaran

pêwîstiya civînê bi dilxweşî anîn zimên. Dîsa

axifgeran derengmayîn û bi sînorbûna civînê

destnîşan kirin û gotin: "Divê rêveberên weşanên

kurdî yên ku li Ewrûpeya çap dibin jî, beş-

darî civînan bibin."

Piştî nîqaşan li ser awa û naveroka kombû-

nê, beşdaran li ser, divê her mehê carekê civînek çêbe, li hev kirin û xwestin ku hejmara kes û saziyan hîn bêhtir be. Wê 17'ê rêbendanê civîna duyemîn durist bibe.

Di beşa duyemîn ya kombûnê de, li ser arîşeyên rastnivîs û rêzimana kurdî hate axivîn. Mijara vê beşê, ketina deng û kurt û dirêj ni-

vîsina peyvên bû. Di vî warî de nîqaş

li ser sê nêzîktêdayinan pêk hatin.

Di civînê de Nevzat Sağ-

nıç û Feqî Huseyn li ser

nivîsina peyvên, gotin,

divê peyv li gorî zima-

nê gel bê nivîsandin.

Bi baweriya Nevzat

Sağnıç û F.Huseyn

Sağnıç ev awa hîn-

bûna zimên jî hê-

santir dike. Wan we-

kî mînak jî gotin, di-

vê jî dêvla: "rojname-

ya min" "rojname min"

bê nivîsandin.

Li aliyê din Zana Farqî-

nî, Torî û Sami Tan aligiriya

parastina bingeha peyvê û qaideyên

rêzimana kurdî kirin û diyar kirin ku zimanê

gel ne yekgirtî ye û wê bi vî awayî gelek alo-

zî derkevin holê. Her wiha wan bal kişand ser

zimanên cihanê û gotin li hemû cihanê zimanê

axaftin û nivîsînê ne yekpare û yekgirtî ye.

Dîsa Yakup Karademir, Habib Çinar, Ali

Karadeniz her çiqas aligiriya rêpîvanên rêzi-

manî kirin jî, wekî din dan xuyakirin ku wekî

istîsna awayên din yên peyvê jî bîst nivîsandin.

Piştî nîqaşan hat pejirandin ku divê peyv li

gorî pîvanên rêzimanî û bingeha peyvê bê ni-

vîsîn. Bi gîştî hat gotin ku wê he-

mû beşdar li gorî biryarên civînê

tevbigerin. Lê F. Huseyn Sağnıç,

li dijî vê yekê derket.

Gerîndeyê Rojnameya Hêvî

Fehim Işık jî got ku em dikarin

alfabeya xwe jî biguherin, lê divê

ev biryar wekî pêşniyaz bîst ragi-

handin.

Di dawiya kombûnê de hat da-

xuyandin ku, wê biryarên civînê

ji hemû saziyên kurd re bê şandin

û wê ji Ewrûpayê jî beşdar bîst

vexwendin. Li aliyê din di civînê

de şewaza nîqaşê gelekî erênî bû

û beşdar bi dilxweşî ji kombûnê

veqetiyên.



1992

Stêrk dixuricîn ji esmanê welat

stêrk,

Gotina pêşiyên e,

Xuricîna stêrkan hatin

An jî çûyîna mirovên pak e

ji rûkê xaka sar.

Di berfanbara 1991'ê de, di bûyera Kampa Qulpê de bû tîrêj û ronî da riya me.

Serê me bi we bilind e.




M. Mîrza Bilgîç
(Tîrêj)

ZANA FARQÎNÎ

A. WELAT/ STENBOL

TÎŞK

Nivîsê nûştoxê
ma nekewt
destê ma



Lerzan Jandîl

**Hejmara sedî ya
Azadiya Welat pîroz
be!**

WELAT

Xwedîderketina li ziman, xwedîderketina li nasnameya mirov e, ji bo ku Azadiya Welat karekî ew qas girîng girtiye ser milên xwe, divê ev karê çandê bê pîrozkirin.

Ji bo derketina hejmara 100'î ya Azadiya Welat, em xebatkarên rojnameyê pîroz dikin û temenekî dirêj jî vê rojnameya me ya neteweyî dixwazin.

*Kurd im dixwînim
Zilmê dibînim
Dijmin bizane
Çiya dihejînim*

**Xwendekarên welatparêz
ên Zanîngeha 100.Yil'a
Wanê**

Gurê Ehmeq

Çir çirokê rûnê rokê
Bêrivanê berda cokê

Bi rûnê wê co miçiqî
Wekî avê di çem de herikî

Golika xala çû pişt mala
Bi dengê xwe bang kir kala

Golikê got: Ûrr...!
Xênî got: Xurr...!

Pîrê got: Hawar û qîr...!
Kalo got: Riya min bi ser de kur...!

Birûskê kir şik û teq rex
Li dora gund digere gurekî ehmeq

Ji birçibûna newq guvaştî
Li dora pez diçû dihat

Çav kir bizina kulek
Got: Vay hate ji min re qismetek

Ji bizinê re got: Were ba min,
Guhdar bike jiyana min

Bizinê fêhm kir ku gurê wê bixwe
Ket tatola xelasiya xwe

Got: Xalê gur, li min guhdar bike
Ez zanim tê tim min dake.

Lê binêre ev şivanê pîr
Lênexist rojekê ji min re bilûr

Li ser pišta min bike zûrezûr
Wê ji min re bibe wek bilûr

Siwar bû li ser pišta gur
Dev xist qûloça, kir zûrezûr

Bizinê lez kir ber bi colê wê çû
Şivan jî pê hesiya, rahişte ço

Bi kotek û dar û beran
Gur qewirand ji wan deran

Gur got: Ev çî bû hat serê min
Tevde bela ehmeqiya min

Bi rê de diçû û difikirî
Nihêrî ku hesp digere


Ji hespê re got: Were ba min,
Ji bilî te nîn e hevalê min

Hespê niyaza wî zû fêhm kir
Tu rê nedidî, dikir nedikir

Gur got: Ma tev ev çî ye?
Hîn gelek hunerê min hene

Li ser pišta hespê siwar bû
Hay jê tune gund li jêr bû

Hespê lez kir çû nava gund
Gel rahişte dar û tiving



Gur bi zorê xwe xelas kir
Li bin darê xwîn li xwe sar kir

Got: Îcar ezê bi ku de herim?
Weleh ezê ji birçîna bimirim

Raketibû li biniya darê
Xuya bû carekê guhê kerê

Got: Hey kero, kerê gurî
Ma îcar tê, bi ku de herî?

Bang kir kerê got: Were rûne,
Ev çî gera te yî bêsûd e?

Kerê her du guhên xwe bel kirin
Niyaza gurê birçî fêhm kir.

Got: Xalê gur ez feqîr im
Ez kal bûme ne pir jîr im

Ev mixê di lingê min de
Ji bo wî xwediyê min ez berda me

Ger ev mixa te derxista
Ezê xelas bûma ji ber desta

Gur got: Ew pir hêsan e,
Xwezî yê wekî tê tim bihata

Kerê lingê xwe bilind kir
Dirêjî ber devê gur kir

Hîn gur li mix digeriya
Kerê pî avêt mêjiya

Gur ket û pir hezizî
Kerê bazda bi lez û bezi

Gur hêdî hêdî rabû ser xwe
Got: Ha ez û ha kerê gurî

Ma bizina kulekê bêşivan
An bav û kalê min î bilûrvan?

Ez siwar bûm li hespê rewan
Qey bavê min e berabazê wan?

Dawiyê min kerek dîbû
Tu dibe qey bavê min nalbend bû

Kes tune li serê min bixe kevirekî
Ezê bimirama ji xwe re bi rehetî

Wê demê kil bû dara berî
Kevirek hat ji jor de li ser serî

Serî şikest û xwîn herikî
Gur bû termê wek textekî

Çiroka min li serê giha
Rehmet li dê û bavê guhdaran

Ji xeynî zordar û xwînxwaran
Û mirovkujên li paş dîwaran.

Pêwîstiya akademîkbûnê û Zend


Yek ji girîngtirîn hêmanên dewletbûnê, şarezabûna pişeyî ye. Girîngiya pisporiya di karekî de bi vê gotinê tê selmandin. "Kesekî/e ku dixwaze her tiştî bike, nikare tiştêkî bike." Sedema vê kurte-nîrxandinê, pêşgotina hejmara kovara Zend a 3'yemîn e. Wekî tê zanîn, Zend weşana Înstîtuya Kurdî ya Stenbolê ye û kovareke demsalî ye.

Di pêşgotina vê hejmarê de, girîngiya şarezabûna pişeyî tê destnîşankirin û hemû Kurdistanîyên ku di warê zanistî de dixebitin, ji bo lêkolîn û xebatên zanistî tîn vexwendin. Ji bo xebatên bi vî rengî jî, pêwîstiya kadroyên nûjen yên ku ji aliyê hişmendî ve taybetmendiyên "jiyana nû" di kesayetîya xwe de dihewînin, tê zimên.

Di vê hejmarê de, Mehrdad Îzady li ser 400 şaliya nivîsandina "Şerefname" dîtî û boçûnên xwe nivîsîne. Lê nivîs bêtir, bi nîrxandinên xwe yên li ser netewebûna kurdan, balê dikşîne. Bi bîr û bawerîya Îzady, mirov bi Şerefnameyê têdigihêje ku, kurd berî niha bi 400 salî jî bi hest û çanda xwe neteweyek bûne. Dîroknasê kurd, li ser naverok û wergerên Şerefnameyê jî agahîyan dide û wê wekî girîngtirîn xebata li ser dîroka neteweya kurd bi nav dixe.

Di vê hejmarê de, S. Bulut bi navê "Li Mezopotamyayê Heterodoksî" gotarek nivîsiye. Bulut di vê gotara xwe de li ser tevgerên heterodoksî yên Anatoliyê û Mezopotamyayê rawestîya ye. Bulut wan tevger û serhildanan wekî sosyalist bi nav dixe û diyar dixe ku, tevgerên îro-

yîn yên sosyalist bi qasî van tevgeran piştgiyariya gel bi dest nexistine. Di vê gotara ku ji aliyê Mehmed Serhedî ve ji tirkî hatiye wergerandin de, ji bo kesên xiristyan (isewî) peyva "fileh" hatiye bikaranîn. Ev peyv di jargona (söylem) feodal a civa-ka kurd de tê bikaranîn û di nav xwe de heqeret û biçûkdîtîne



dan, kesên ku dibêjin; "Atatürk dixwast kurd otonom bin" rexne dike û ji bo vê yekê jî ji pirêzeya kemalîzmê sûde werdigire. Di vê nivîsê de Topal Osman wekî Osmanê Kulek hatiye bikaranîn. Wekî tê zanîn navên kesana li zimanekî din nayên wergerandin. Disa digel peyva "Der bar"ê daçeka "di" hatiye bikaranîn. Lewre "der" bi xwe cihê "di"yê digire.

Nivîskarê Azadiya Welat Çiya Mazî

zimên û kesên ku dengbêjan biçûk dibînin, rexne kirine. Li aliyê din Çiya Mazî der barê bikaranîna argoya di çîrok û romanên de, dide zanîn ku divê argo bi awayekî "kedîkirî" di çîrok û romanên de bê nivîsîn. Li gorî dîtina me, divê nivîskar rastiya jiyanê bi ser guhê xwe re neavêje. Her wiha argo ji bo pêşketina wêjeyê peywireke gelekî baş bi cih tîne.

Di Zendê de bi zaravayê dimilkî nivîsa J. Espar hatiye weşandin. Espar di vê nivîsê de, li ser pirtûka Mehmet Gülmez a bi navê "Dêrsim ra ve Dare Estere Seyîd Riza" dîtî û ramanên xwe derbirine.

Li aliyê din, Şiyar C. Oremar li ser jiyanê Îsmail Axayê Şîkak gotareke berfireh nivîsiye. Oremar di vê gotarê de digel kurte-dîroka rojhilatê Kurdistanê, çêlî Serhildana Îsmail Axayê Şîkakî dike.

Ji bilî van nivîsan ev nivîs di vê hejmarê de hatine weşandin. "Di Kurmancî de erk û fonksiyona 'di' yê", (Zana Farqînî), "Di dîroknivîsîna kurdan de du bawerî", -(Cemil Gündoğan), "Dîroka Başûrê Kurdistanê ya nêzik" (Zülküf Kışanak), "Zargotina kurdî û metodên lêgerînê" (Ahmed Aras), "Kirdar û katle zimanî kurdî" (Kurdo Eli), "Ziman" (Feqî Huseyn Sağnîç), "Wergerandin û ber bi sazîkirina wê ve" (Xalid Mihemed), "Lêhûrbûnek li ser Devoka Semsûrê" (Samî Berbang).

MAZLUM DOĞAN

Di pêşgotina Zendê de, girîngiya şarezabûna pişeyî tê destnîşankirin û hemû Kurdistanîyên ku di warê zanistî de dixebitin, ji bo lêkolîn û xebatên zanistî tîn vexwendin.

vedigire.

Gotara Îsmail Gölbaş jî li ser kes û derdorên ku Kemalîzm û Atatürk wekî dostê kurdan bi nav dikin, hatiye nivîsîn. Gölbaş di nivîsa xwe ya bi navê "Pirsgirêka kurd û Kemalîzmê" de digel kur-

bi navê "Bandora Çiroka li gel û nivîsandina wan" nivîsek darêtiye. Di vê nivîsê de Mazî, bi taybetî li ser girîngiya fikirîna bi kurdî nîrxandinên heja kirine. Wî di nivîsa xwe de jî bo fikirîna bi kurdî girîngiya dengbêj û gundiyan aniyê

Huner

OSMAN ÖZÇELİK



"... Vîladîmîr İlyîç! Ji bedêla ku ez bibim hevparê bédengîya derheqê karê têkbirina hêza gelê rûs a herî bedew de, ez jî cihê xwe li kêleka wan kesan digirim û girtin û cezayê hepsê hildibijêrim. Ji bo min bêşik eşkere-bûye ku 'yên sor' jî wekî 'yên spî' dijimînê gel in..."

Di sala 1919'an de li Rusyayê qeflek rawestîbîr tîn girtin. Nivîskarê binavû deng Maksîm Gorkî, ji Lenîn re nameyekê dişîne û vê bûyerê protesto dixe. Maksîm Gorkî, nivîskarekî bêtirs e. Di vê nameya xwe de, li cihêkî din jî ji Vîladîmîr İlyîç Ulyanov Lenîn re wiha dibêje: "Ez dizanim tu de van gotinan her car bibêjî 'şerê politîk', 'ên ku ne bi me re ne li dijî me ne', 'mîrovên bêteref bi xeter in û hwd."

Gava min ev name di kovara Nûdemê de (hej. 23 1997 S. Demir) xwend, careke din li ber çavên min zelal bû ku ji hunermendiyê re namûs û cesaretê divê. Divê mirov biwêre ji Lenîn re bibêje "Vîladîmîr İlyîç!" û divê mirov bikaribe li hemberî her çewtiyê rabe. Ger

çewtî ji hevalbendê te yê herî heja hatibe jî. Hunermendî û rewşenbîrî hilgirtina barekî giran e.

Ji ber ku dîktator bi hêza huner û hunermendiyê dizanin, karê wan ê yekemîn civandîna hunermendan e. Îmkanên mezin pêşkêşî wan dikin, ku hunermend, berhemên hunerî biafirînin. Belê dîktator şertekî dide pêş: "Hûnê behsa min bikin!" Dixwazin ku hunermend behsa jîrbûn, zanebûn, biaqilbûn, bedewbûn û mîrxasiya dîktator bikin. Pirtirê hunermendan (!) vê mercê dipejîrin, yên ku qebûl nakin, sirgûn, lêdan, girtîgeh û hejarbûnê didin ber çavên xwe.

Bi navê hunerê bedew, berhem derdikevin holê. Belê hunerî ne-jî dil be û li ser daxwazê hatibe afirandin, jî hest û dilmînen bilind bêpar dimîne, bedewî tê de namîne. Emrê hunerê û hunermendên wiha, bi dirêjbûna emrê dîktator ve girêdayî ye. Gava hikûm ji destê dîktator diçe, berhemên hunermendên wisa jî digihêjin qîmeta xwe ya rastîn û wekî tê zanîn cihê berhemên wîlo "sergo" ye.

Huner mîna kulîlkên avî ye. Bê çawa kulîlkên avî bêav nikarin bijîn, huner jî bê azadî nikare bijî. Disa em dizanin ku berhemên herî bedew, di nîrê zor û zordestiyê de, bi destê hunermendên têkoşer û azadîxwaz hatina afirandin.

Li Rusyayê berî şoreşa Bolşevîkan zordarî û neheqîyê mezin hebû. Civat keliya û gel li rîya xelasbûnê digeriya. Di wê demê de, bi

sedan hunermend derketin holê.

Hunermendên ku rihê xwe gihandin kûraniya gelê rûs, li pey hev berhemên heja diyarî gelê xwe û yên dinyayê jî kirin. Nivîskarên herî bi navûdeng di vê demê de derketin û şoreşa bolşevîkan li ser vê bingeha hunerî mezin bû, bilind bû û bi ser ket.

Piştî biserketina şoreşê, rêveberên şoreşê li ser navê parastina şoreşê, rexne qedexê kirin. Hunermendên rexnegir, an hatin windakirin, an jî ji welêt revîyan. Parêzger û pesindarên şoreşê gihîştin mertebeyên bilind. Bi sed-hezaran pirtûk û berhemên hunerî hatin afirandin, belê ji wan yek jî bi bedewbûn û hêza xwe ya hunerî, ji nav tixûbên Rusyayê derneket û xwe negihand gelê dinyayê. Û jî berhemên wiha yek jî nagihêje pêşerojê.

Ji van-rojan navek ma.

Soljenitsin...Soljenitsin ne xwedî pênûseke bi hêz e. Belê ew bêtirs bû û li hemberî qirêjiyan helwesteke rast danî. Ji ber vê yekê ye ku îro em navê wî dizanin.

Huner û hunermendîya kurd, bi dûv şop û reh û koka xwe ketiye. Em li koka xwe digerin. Gava hunermendên kurd xwe gihandin bapîrê Evdalê Zeynikê û çêkerê strana Memê Alan û hunermendîya kurd a nûjen, bi hev û dirî re hûnand, emê bi ser bikevin.

Em di dema berî şoreşa Rusyayê de ne. Bêhna xwe bi xwe ve dagirin, hindik ma...


Heciyê fenek

Li gundekî jin û mêrên bi navê Hecî Îso û Edûlê dijîn. Zarokên wan hemû zewicandî, bi malbat bûn û ji wan cihê bûn, her yekî wan çû bi derekê de. Îcar hemû karê erd û malê bi ser wan her duyan de mabû.

Pîreka xalê Hecî Îso jî pir diwestiya, îcar di ber xwe de tim pitepit dikir û digot:

— Oyy dayê! Ez mirim. Ma-la min xera bû! Ev çî hal e ku ez ketimê? Ez hewş-mewşê, axûr-maxûr paqij dikim, firaq-miraq, cil-milan dişom. Diçim nav erd-merda, aşêf û maşêfê, paleyî-maleyiyê dikim. Hal di min de nema hawar gidî!”

Van gotinan gava her cîran û mêvanê ku tê mala wan, ji wan re jî dibêje û giliyê xalê Hecî Îso dike. Ji ber ku xalê Hecî Îso hindik alikarî didayê. Xalê Hecî Îso mêze dike ku ev wiha nabe. Pîreka wî, wî li ber xelkê dihetikîne. Rojekê dîsa xaltîka Edûlê jî mêvanên xwe re gilî û gazinan ji Hecî dike. Hecî gazî pîreka xwe




dike, dibêje:

— Ka were divê em vê mesele çareser bikin. Ez bawer im ku tu pir diwestî. Ji vê pê de emê kar li hev par bikin. Tu nivî bike, ezê jî nivî. Xaltîka Edûlê pir şaş bû û di dilê xwe de got: “Gelo ev çî rehm ketiye dilê Hecî. Em gihîştin vê emrê û wî tu carî kar hevpar neki-

riye.”

Xalê Hecî got:

— Divê ku bi edalet be. Tu hewşê paqij bike, ezê mewşê, tu axur, ezê maxur paqij bikim, tu firaqa bişo, ezê miraqa, tu cila ezê mila bişom. Tu aşêfê bike, ezê maşêfê, tu palehiyê bike, ezê malehiyê bikim...”



Elektrik nû hatibû gundekî Kurdistanê. Berî ku ceryanê bînin, elektrîk çêker hatin qablo-tel û lempe, prîz cihê fişa çêkirin di malan de.

Li gund jî, meta Xezal hebû, ew tenê dijiya û pir di nav temenê de çûbû. Îcar çavê wê jî hew xweş didit. Meta Xezalê di dawiya temenê xwe de wê ceryan bîdita. Ji bo vê pir metela dikirin, ka ceryan çî tişt e?

Dema elektrîk çêker hatin mala wê, ew di cihê xwe de nedisekinî. Di ber wan re diçû û dihat digot: “Ê ka we ceryana mala min çênêkir?” Elektrîk çêkeran karê xwe xelas kir û derketin. Îcar meta Xezalê çû li hundirê mala xwe temaşe kir. Çiqas nêrî, ji qabloyan tiştêk fêhm nekir. Lê gihîşt cem prîz û sekinî. Dêhna xwe dayê û bi kêfxweşiyê mezîn qîriya:

“Weyla ez bi qurbana we, çiqas ji meta xwe re tiştêkî baş çêkirine. Ya Xwedayê mezin!... çendî di vê dinyayê de çî însanên qenc hene. Dizanin ku çavê meta wan Xezal baş nabîne, ji bo ku ez tim lê negirim cihê derzîdankê (cihê derzî û şûjinê) ji min re çêkirine.”

Meta Xezal bi lez çû şûjina xwe anî û hat, da ku biceribîne ka wê lê were an na. Meta Xezalê şûjinê hêdika kire qula prîzê. Meta Xezal cend caran lerizî û dû re ceryanê ew hejand û bi derb ew li erdê da.

Dema Metê bi ser xwe ve hat, çavê xwe vekirin; dît ku cîranê wê li ber serê wê ne. Bi xemgîni û hevîşikestî di ber xwe de got:

“Wey segbav, min dizanibû ku, ev romên kûçik-bav tiştêkî baş ji me re çênakin. Eger tiştêkî baş bûya nedidan me!”

BI XELAT... XAÇEPIRSA BI XELAT (100) XAÇEPIRSA

H	E	T	T	V					
R	E	M	Z	K	A	R	T	A	E
B	E	R	N	A	M	E	T	E	
S	A	H	T	A	M	E	N		
N	R	E	N	T	R				
G	N	E	R	M	T	R	A	N	
P	S	O	W	N					
R	A	D	E	T	A	S			
R	O	M	I	N	A				
J	I	R	I	P	A	N			

Bersiva Xaçepirsa 98'an


Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixînin û bi riya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 100'î salnameya Özgür Halkê ya 1998'an e.




Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsê de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

Pênc kesên ku xelata hejmara 98'an salnameya Özgür Halkê qezenc kirine: Bayram Aygürt/Amed, Atacan Daruğa/Wan, Abdullah Oral/Mêrdîn, Arif Oktay/Tarsus, A. Vahap Bal/İzmir

Şehidek (wêne)	Sotinerê Romayê	Str	Dawera hidrojenê	Erzan	Kirde
Sohbet	Tipek	Qad	Ecele	Tipek	
				Berepaşki emeg	
				Bax	
Tipeke kurdî	Naveke jinan			Daçekek	
Serlistikva nê filman	Herdem			Teyrek	
			Pirtûkeke piroz Xwarineke şewalan		
Tewtewe, dînk				Marên mezin	
Xav				Şairek	
		Pehn		Parkitek	
		Tipek		Parçe	
Dawera azotê	Dengdêrê n 'Xûda'				
Ji rêzê	Rêxistnek				
		Mektup			
		Kurtenivîs a bijîjk			
Arvan			Nêbatiyek e bi bêhn		
Tevlhevî			Tipek		
				Dengdêra 'Tir'	




WELAT

 Rojnameya Hefteyî
(Haftalık Gazete)

 Li ser navê
Zerya Basın ve
Yayıncılık
San. Tic. Ltd. Şti.
(adına)
Xwedî (Sahibi)
CELALETTİN
YÖYLER

 NAVNÎŞAN
Ayhan Işık Sk. No:23/3
Beyoğlu / İSTANBUL
TEL-FAX:
(0 212) 251 90 13

 Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

 Berpirsê Karên Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

 Berpirsê tékiliyên bi gel re
(Halkla ilişkiler müdürü)
METİN AKSOY

 Berpirsê Saziye
(Müessese Müdürü)
TAHİR ELDEMİR

 ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

 BELAVKIRIN
BİRYAY Dağıtım

 NÜNERİTİYÊN ME
(Temsilciliklerimiz)

Munchen:

 (Nünerê Giştî yê
Ewropayê)

 Mahmut Gergerli
49 871 67 08 15

Brüksel:

 Medenî Ferho
32 532 721 12 03

Suriye:

 Jana Seyda
Helim Yûsiv

Berlin:

 Silêman Sîdo
00 49 30 691 6495

Hannover:

 Selim Biçûk
49 572 18 13 60

Stockholm:

 Robin Rewşen
46 87 51 05 64

Bonn:

 Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 62 49

Hollanda:

 S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

Polîtî'kayê' dewlet û tepşiyayeyê zîndananan

Verde new des seran grewê weşanîn ser, wahşet û kiştênê zîndananan ser, kesî ke qisey kerdê, hema zîndanê Amedî ameyê ci vîrî. La belê hîrê-çehar serî yê grewê weşanîn ser, îşkence û wahşetanê zîndananan ser kes ke qisey keno Zîndanê Erziromî yo jî yeno ci vîrî. Dewleta zey zîndanê Amedî tepşiyayan rê zilm kena, îşkence kena, haqanê tepşiyayan desteser (xesp) kena û zîndananan tepşiyayan rê kena cehnim. Coka tepşiyayê ke Zîndanê Erziromî de ser de di finî hîrê grewê weşanîn kenê. Dewleta hetanî grew çewres-pances roj mebo, tepşiyayey nêweşî mebê goş nêdana ci. Senî ke tepşiyayey benê nêweşê giranî, merdin yeno nezdî, hema wastenane tepşiyayan qabûl kena û grewê weşanîn qediyeno.

Ewro jî zîndanananê Erzirom, Nazilî û Sêrt de grewê weşanîno bêaçar nayin (dönüşümsüz) rameno, ê bînan de ê açarnayin (dönüşümlü) rameno. Ek grew ewro meşt meqediyoy, bêguman xeylê tepşiyayê bîmrê yan jî seqet bîmanê. Çimke zîndanananê Erzirom, Nazilî û Sêrt de grewê weşanîn hîris rojî ra ravêrd. Şima jî zanê jew mardin hîris-çewres rojî veşan bîmano ey de seqetîna fizikî û psikolojik vejyena werte. Xora dewlet jî coka haqanê tepşiyayan desteser kena ke tepşiyayey ya bîmrê yan jî seqet bîmanê û şarî ra tecrit bê. Rastî ek wina mebo awa çira haqan xesp kena û badê hîris-çewres rojî, ê haqan peyser dana.

Dewleta tirka ewro ebi tepşiyayan şarî ra tecritkerdin jew haqan destserkerdina nêmanê. Qandê tecritkerdin, ci dest ra çiçyo yeno, kena. Kamîn şarîstan de kurdî yan jî mardimê demokrafî yan jî faşistî vêşî yê (zaf ê) tepşiya-



yan rêşena (rûsnena) zîndanananê ê şarîstananan. Nimûne zîndanê Ordu, Uşak, Trabzon, Giresun, Çanakkale, Erzirom û zey nînan. Dewleta wina kena ke kes meşro ziyaretê tepşiyayan û tepşiyayey tenya bîmanê.

Dewleta wina kena. Yanê ci dest ra çiçyo yeno kena. La belê tepşiyay û mardimê tepşiyayanê jî ci dest ra çiçyo yeno, kenê. Taybetî jî tepşiyay. Tepşiyayê qandê azadiyîna şarê kurd heme çî kenê. Yanê jew mardim ke çehar desan miyan de bîmano, se keno ey kenê. Tepşiyayê ewroyinê jî ray da Mazlum Doğanî ra şinê û vanê ma dê qandê azadiyînda şarê kurd ma dest ra çiçî bêro, ma dê bikim. Merdimê tepşiyayanê jî winî kenê. Çend rojî yo mayê tepşiyayanê Zîndanê Nazilî verde nişenê ro û vanê ma dê qeçanê xo tenya meviradim.

MEMED DREWŞ

Şarî NÇM bêwayir nêternê

21'ê meng de polisanê Adna şaxê NÇM wa Adna rê 2 finî vardayin viraşt. Vardayinê siftayin de êkê ameybî konserê Koma Rojhilat goşdarin bikrê, nasnameyê inan jew jew kontrol kerd, Serokê NÇM' a Adna Sabrî Kahraman û endamê Koma rojhilat pêro giroftî binçim û rojê didin viraday. Vardayinê didin jî bê keverê teverî, keverê bîni yanê keverê eyvana konser, sînama û tiyatroy muhur kerdî.

Vardiyn ser 23'yê rêbendan de sermayanê NÇM ya Adna Dilber Taş daewnayin (eşkerakerdin) viraşt. Sermeyana NÇM vardayin protesto kerd û wina vat: "Dewleta tirk verî jî şaxê ma racenay, embaz û sermayen ma giroftî binçim, la belê nêşa verê xeftiyayanê ma bigiro û awa meşo verê xeftiyayanê ma bigiro. Madê deyrane biratiyan vatîni û xeftiyayanê xo zey verî biramimî û qe jew teqeto jî meşo verê nê xeftiyayanê ma bigiro.

Kişt bîni ra vardayin ser şarê kurd û komalanê demokratî jî NÇM bêwayir nêternê û qandê vardayin protesto kerdin. Şaxê Adna ziyaret kerd û dest da sermayan û xeftiyane NÇM.

Rewşa aborî û ramyarî ya kurdên Kanadayê

Jiyan ji her alî ve temamkera hev û du ne, çî rewş bi pêş bikeve, wê tesîra xwe bike li ser rewşa di; bi boçûna min ger em neşên bi rêka ramyarî hev û du bigirin, ji ber çendin egera li vê demê, manaya wê ew nîn e, ku çî rê nîn e û divê em ji hev û du dûr bikevin.

BARÛDOXA ABORÎ

Kanada welatekî pêk hatiye ji miletên mişext, ji bilî pêstoran (native) her çî miletê qesta vê derê kirî, li ser binyateke aborî hatiye vê derê, bigirê ji Fransiya, Îngiliz û heta Spanya û Ukraynayê û hwd.

Her çende Kanada welatekî ne kevn e, pêş çendin welatên cihanê ve, lê ji ber ku xelkê hatî vê derê bi rengekî gelek cidî karin kirine û niha Kanada yek ji welatên pêşketî tê hejmartin. Aboriya vî welatî heta salên destpêka 1990'î di pêşketin û werarê de bû, lê li salên van dimahiyê de aboriya vir pir hatiye xwarê û betalî bi rengekî diyar peyda bûye û aboriya berdewam di zêdebûnê de ye.

Helbet wekî me behs kir kurd li destpêka salên 1990'î de qesta vir kirin; penaberên ku di nexweştrîn barûdoxê de hatin. Her kesê bivê cihê xwe di nava vê komelê de bike; çî bivê bike, divê xwedanê karekî baş be, yan diravekî baş hebe, çimkî karên vir hemûyan zimanek baş û serbûrek baş pihê divên, ji wan jî komputer û şahidên zanko û peymangehan.

Wekî berî niha me destnîşan kiribû; xelkê ji mêj ve li Kanadayê zor bi zehmet karî peyda dikin; lewma ji bo kesên ku nû tî her bêjî zehmet e. Lewma piraniya kurdan bêşixul in û bi arîkariya dewletê dijîn ku ew jî tenê bişin û nemirin; hindêk kar hene kurd dikin, lê zorbeyê wan ne reşmî ne û çî zeman tê de, nîn e bo nimûne şixul kirin li xwaringehên pizzayê yan li baxçe û sîfêlyaya teksiya... hwd.

Çend kesan ji kurdan şiyane (karîne)



hindêk karên serbixwe vekin piştî mandîbûna çend salan bo nimûne (one for one pizza) li Otoawa; yan çendin xwaringehên cuda cuda li bajarên Kanadayê; li vekirina karên xoy berdewam in; ew jî tenê rêk e, niha ku kurdan pêçêdibe, çimkî dîtina karên dewletê şertê wan zor in vî nevî (cillî) pê çênabe, di be zarokê taze pişt re dibin şên.

Bi boçûna min karî kirin bo kurdan gelek fireh e bes li ser arîkariya dewletê nemînin; çimkî mirineke hêdî hêdî û arîşeya (problem) pirtir lê dike û hevi-

siviktir lê be.

REWŞA RAMYARÎ

Her çende kurd dîr in ji welatê xwe, lê hê peywendiyêke mukim digel rûdan û werarên doza mîletê xwe hene. Êkgirtin û xurtbûna bizavên kurd lê axa welat gelek tesîra xwe dike li ser barûdoxên ramyarî li derveyî welat, helbet li kurdên li Kanadayê dijîn jî bandorê dike.

Çaxê peywendiyên partiyên kurdan

Em dikarin bi rêka çandî (komeyati) hev û du bigirin.

wekî me li babetê çandî şrove kiribû, yan di warê

aborî de bixebitin ku wê rojekê xaleke erênî peyda

bike di warê ramyarî de jî.

ya dikuje û mirov bêbizav dimînin. Helbet xwendin bo zarokan piştî pola 12'yan bi pere ye. ger xizana diravek nebe zarokên xwe bi rê bike zankoyê û collecê; wê zarok bê xwendina bilind bimîne û ew jî wê di nava arîşeyê cuda cuda de bimîne û wê tesîra xo bike li ser pêşeroja mîlet. Kar dîtî zehmet e, lê ger mirov bi xem ve bigire û ji her şixulê ku hebe dest pê bike wê riyên di peyda bibin, alozî wê kêmîtir lê bîn; ji hemûyan girîngtir mirov wê bibe xwedan biryar, karkirin wê barê doza me

nêzikî hev dibin, kurd bi rengekî diyar li vir jî nêzikî hev dibin ji bo çekirina her biryarekê yan rabûn bi ahengeka (şahî) wekî Newrozê yan bi pêkanîna her kombûneka tîkelî hev dibe ku bêt gotin, kanê kî xelkê kîjan parçeyî ye, yan layengirê kîjan partiyê ye.

Lê berevajî dibe, çaxê peywendiyê di navbera bizavên kurdî de xerab di be, dîsan tesîra xwe diket li ser kurdên li derve, hemû bi hev re dibine beş bi beş û her kesek wek reftara partiya xwe dike, guhdariya hev du nakin, ji bo çax-

rekirina biçûktirîn arîşeyê; bo nimûne şerê navxwe yê li başûrê Kurdistanê başûr yekcar barûdoxên kurdan xerab kiriye; çarenebûna peywendiyê partiyên kurdan dibe egera jêk (ji hev) pert û bilavbûna kurdan li her cihî, lê ji wana ji welatên Ewropa û Emerîka jorîn helbet jêk vebûna kurdan ji bo çarekirina doza xwê tesîreka gelek mezin dike li ser ragihandina kurdan li derveyî welat, çimkî heta niha kêşeya kurdan gelek divê bo xurtkirin bi taybetî ji layê ragihandinê ve, dibe ku kurdên li derveyî welat bişên vê buşaye (ferax) ê pir bikin, eger zemîne ji bo wan xweş be.

Ji ber ku kurd demeke ji mêj ve nîn e hatin vir, lewma jî hê diyar nake kanê rolê wan çî ye di sîstema ramyariya Kanadayê de, di ser hindê ye ku gelek xwendekarên kurd hene li beşa ramyarî dixwînin li zanko û peymangehan.

Jiyan ji her alî ve temamkera hev û du ne, çî rewş bi pêş bikeve, wê tesîra xwe bike li ser rewşa di; bi boçûna min ger em neşên bi rêka ramyarî hev û du bigirin, ji ber çendin egera li vê demê, manaya wê ew nîn e ku çî rê nîn e û divê em ji hev û du dûr bikevin. Em dikarin bi rêka çandî (komeyati) hev û du bigirin wekî me li babetê çandî şrove kiribû, yan di warê aborî de bixebitin ku wê rojekê xaleke erênî peyda bike di warê ramyarî de jî.